welat

## Birînêkî le yad neçûwe: HELEBCE



Rûpel 12

Sal:3 Hejmar:108 13–19 Adar 1994 10.000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

*Hildana muafiyeta mebûsên DEP'ê bû sebep ku, zehfê dewletên Ewrûpî li dijî dewleta Tirk tewir bistînin*

# Qûş li Tirkiyeyê teng dibe



- Tewra dewleta Tirk a li dijî Kurdan, ketiye rewşeke welê dij–mirovî, serleşker bi serhişkiyeke welê komîk hareket dikin ku êdî dostên wan ên împeryalîst jî rexneyên giran li wan digirin. Êdî tu mêjî tewra rayedarên Tirkiye ya ku rê li hemû çareyên demokratîk digire, napejirîne û ev jî dewleta Tirk dixe nav çepereke teng.
- Hildana muafiyeta mebûsên DEP'ê bertekiya (reaksiyona) dinyayê kişand. Tirkiye ji ber vê yekê kete tengasiyê. Parlementoya Ewrûpayê biryara protestokirina Tirkiyeyê stand û ji wan xwestin ku, parlementeran serbest berdin û heqê otonomiyê bidine Kurdan.
- Seroka Weqfa Azadiyan a Fransayê Danîella Mîtterrand li ser rewşa DEP'vanan dest bi çalakiyên gurr kir. Mîtterrand bi serokên saziyên navneteweyî û rayedarên hikûmetên Ewrûpayê re hevdîtin û civîn pêk anîn.
- Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî, bêdeng û tevger neman. Wan jî li hemberî biryara meclîsa Tirkiyeyê helwesta xwe dan nîşan û ji meseleya Kurdî re çareya siyasî xwestin. Tirkiye li ser van qewmînan kete rewşa xweparêziyê.

Rûpel 8

*Li Stockholmê*

## Du saliya Welat hat pîrozkirin

Berpirsiyariya Rojnameya Welat a Ewrûpayê, di roja 5'ê meha Adarê de, li bajarê Stockholmê dusaliya Welat pîroz kir. Bi munasebeta dusaliya Rojnameya me, Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê, li Kurdistan Centruma Stockholmê civînek çêkir. Gelekî nivîskar û xwendevanên Welat û mêvan beşdarî civîna pîrozkirinê bûn.

S. Îzzet Güven, li ser navê Komîteya YRWK Beşa Swêdê civîn bi bîranîna şehîdan vekir. Mîrhem Egît, dîroka rojnamegeriya Kurdî, girîngî û berpirsiyariya Rojnameya Welat anî zimên. Amed Tîgrîs jî, li ser ji nû ve organîzekirina (li Ewrûpayê û bi taybetî li Swêdê) Rojnameya Welat rawestiya. Tîgrîs di axaftina xwe de girîngiyê da ser sîstema abonetiyê.

Di beşa dawî ya civînê de, beşdaran dîtinên xwe pêşkêş kirin. Komîteya abonedîtin û belavkirina Welat a Stockholmê, di dawiya civînê de dest bi kampanya abonetiyê kir. Li gor axaftina berpirsiyarê komîteyê, divê heta dawiya meha Gulanê li Swêdê dê hejmara abonemanan ji 400'î bibore.

**NIYAZ**

Belê stêr î
Di şevên jîna hemî
ewr de
Belê roj î
Di şeş xêzên zemîna
fireh
mîna
... çavên te...
Belê gerdûna
sor û pembe
... hî yî
Li ser erşê kişwera
rûken
Belê...
xeleka
Bejna darên
stûw–xwarî
Li der dorên
Tarên
Helebça
û
Helebça.

*Fethulla Huseynî*

# Roja Jinên Kedkar pîroz be



Merheba; Di vê pêvajoya ku têkoşîna me ya serxwebûn û azadiyê bi serkeftinan dixemile de, jinan jî bi pêkanîna artêşê cihê xwe standiye.

Bersiva xweştirîn a ji bo 8'ê Adarê, Roja Jinên Kedkar; bedewkirina jinan e. Dîrûşmeya me ev e: "Jina Kurdistanê ya ku bedew dibe, bedewbûna Kurdistanê ye!" Em 8'ê Adarê, Roja Jinên Kedkar ya Gerdûnê pîroz dikin.

***Dîlên jin yên ji PKK'ê***

# Ji nivîsara pîvana hemdemiyê re

Gelî hevalên hêja û delal. Berî her tiştî ez gelek silavên şoreşgerî li we dikim. Gelo çima weşanên bi Kurdî kêm in û çima kêm tên xwendin?

Li gorî dîtina min, sedemên nexwendinê ev in:

1) Qedexeya li ser zimanê Kurdî

2) Kêmbûna weşanên bi Kurdî

3) Tunebûna dibistanên ku zimanê Kurdî bikin zimanê dersê û hînkirinê

4) Yek jî ev e ku, hinek rewşenbîrên me hene ne dixwînin ne jî dikirrin, û ne jî weşanên Kurdî bi gel didin naskirin.

Tev ku van rêzdikim jî, ez dîsa qebûl nakim.

1) Qedexetî nabe sedemê nexwendinê. Bi sedsalan e dijminên hov û xwînxwar em înkar kirine. Hê jî dikin. Navên me jî qedexe kiribûn, lê îro bi têkoşîna PKK'ê re navên me tên qebûlkirin. Kurdayetiya me tînin zimên. Îcar gotineke Kurdan heye. Dibêjin: "Nanê tirrekan ardê cehî ne"

2) Weşanxaneyên me, ne ji bo xwendinê pirtûkan diweşînin. Ji bo kara xwe diweşînin, dema kara wan hindik be dibêjin berhemên bi Kurdî nayên xwendin; lewma ew zêde naweşînin.

3) Dijmin tu carî bi xweşî dibistanên Kurdî qebûl nakin. Divê em di mal û gundan di kolan û taxan, di avahiyên komel û rêxistinan de, kesên li der û dorên xwe hînî zimanê Kurdî bikin

4) Divê nivîskarên quncikan giraniya nivîsên xwe bidin rexneyên li rewşenbîran, ku hinek fedî bikin hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bibin.

**EZ HEBÛN Û DIJWAR IM**

Ez cotkar û bexçevan im
Li şax û gelî seydvan im
Li nav golan masîvan im
li nava pûş û pelax im

Bi roj gavan û şivan im
Li êvaran karikvan im
Bi şevan jî nijdevan im
Dest bi lûle û qûndax im

Kurê Kawa dest bi tîr im
Ez bi xebata xwe jîr im
Di neyar digerim sîr im
Xwediyê erdê şorax im

Ez wekî moz û korax im
Li bilind cî û çardax im.
Geh li jor û geh li nax im.
Li erd û zeviyan kax im

Li bilindiyan bi tîn im
Dilê kedxwar dihelînim
Tovê jînê direşînim
Germa tîrmeh û tebax im

Ez karker im dest qirêj im
Bo aştiyê xwînrêj im
Çemê Ferat im dirêj im
Bo dehl û bostan û bax im

Bi kevan û tîr û tûr im
Li ser şeqam û papûr im
Li pêş leşker bi şeypûr im
Ez xweşmêr û bi darax im

Tim mafzan û bi rûmet im
Li jêr û jor li ser xet im
Rast û durist ne xelet im
Ji bo gelê xwe çirax im

Li ser çiyan çavdêr im
Li nav deviyan çavnêr im
Li nav zeviyan bi bêr im
Ez hostayê çît û cax im

Li ser rêça Şêx Seîd im
Ez rêhevalê Egîd im
Şoreşger im berjewend im
Xurt im ne jar û kambax im

Geh li şer. geh jî li mal im
Rind û hêja û delal im
Bi gore û bi destmal im
Li nava kolan û tax im

Şoreşger im teyrê baz im
Mirovperwer. serfiraz im
Ne mêrkuj im aştîxwaz im
Li ser gir û kaş û dax im

Ez Kurmanc û Lor û Sor im
Li mêtinkaran dibori m
Zana û jîr û pispor im
Bi rêxistina binax im

Bi dengê xweş stranbêj im
Li şevbihêrkan çîrokbêj im
Ez sitêrka bi tîrêj im
Li bin siya dar û şax im

Ez paleyê dest bi qirim im
Hezkiroxê dew û sirim im
Li cenga Angola birrim im
Tim li ser şikêr û şax im

Cenanê titûna baş im
Li erdê beyar û kaş im
Ez ji gustîlkan re qaş im
Bi birmotî û kamax im

Dest bi mer û tevr û bêr im
Xwediyê welatê zêr im
Bi xebata xwe ziktêr im
Xwedî nivîn û firax im

Ez bo bilbilan hêlîn im
Bo çekdar nanê sêlîn im
Dengê sazê şeş têlîn im
Ji bo nabînan çewsax im

Aştîxwaz li dij neyar im
Li serê lat û zinar im
Tirsa li dilê kedxwar im
Ezê xwînmij ji text dax im

Li Girê Selet dijwar im
Hebûn im li binê dar im
Xof û tirsa cerdevan im
Bê saw û lerz û bê pax im

Ez şoreşger im. Hebûn im
Bi şop û rêç û bi şûn im
Qelendê welêt sorxûn im
Diherikim li ser şax im

Welatperwer im. dijwar im
Ez li dijî mêtinkar im
Ez fîda û xebatkar im
Ez movik û pel û şax im.

***Ş.C.Girê dêrsilê/Amed***

# Nivîsara Welat

## Di şûna Welatekê de du Welat

Belavkirina rojnameja me hê jî bi destê me û bi derfetên (îmkanên) me yên sînorkirî didome. Ji roja ku em vî karî bi xwe dadigerînin ve % 80 xwendevanên me ji xwendina Welat bêpar mane. Ev yeka han, bi rastî me pirr diêşîne. Tevî vê yekê, wek ku berê jî me anîbû zimên, îmkanên me yên sînorkirî rê li ber me digirin ji bo ku em xwe bigihînin hemû xwendevanên xwe. Dîsa jî, em hewl didin xwe ku em çareyan bibînin ji bo vê pirsgirêka girîng. Bi vê mebestê, vê hefteyê me bi şîrketa belavkirinê (BBD) re peymanek çêkir da ku Welat li hemû bayiyan belav bibe. Heger ku tiştekî nû yê negatîf neqewime, hefteyeke din wê Welat bi navgîna vê şîrketê bê belavkirin û ev piersgirêk jî bi vî awayî wê bi giştî bê çareserkirin.

Li jor me got, 'Heger tiştekî nû yê negatîf neqewime...' Ji ber ku li welatekî ku lê demokrasî tune ye mirov nizanin di rojên li pêş de çi li benda wan e. Gelek caran mirov plan û bernameyan ji xwe re çêdike û mêjûyekê kifş dike ji bo pêkanîna wan, bes ji nîşka ve tiştên wisa nehêvîkirî diqewimin ku hemû plan û bernameyên mirov serobino dibin. Mesela, berî çend mehan me ji xwendevanên xwe re dabû xuyakirin ku emê derengtirîn ta 21'ê Adara 94'an hin guherînên bingehîn (wek zêdekirin û rengînkirina rûpelan) di Welat de çêbibin. Lê dewletê bi awayên dîrekt û îndîrekt astengiyên welê dijwar derxistin pêşiya me ku ji bêmecalî me ev bernameya guherînên bingehîn da paş. Helbet em ji vê fikra xwe venegeriyane, bes em nikarin û naxwazin di van şertan de mêjûyeke diyar jî tesbît bikin.

***Ger Kurd bi delalî nexwînin, emê bi zorê bi wan bidin xwendin. Wekî Kurdî zimanê me ye em mecbûr in lê xwedî derkevin. Wek gava yekemîn ji vê hefteyê û şûn ve em kampanyaya kirrîna du rojnameyan didin destpêkirin. Ji bo fêrkirina zimanê Kurdî û zêdekirina xwendevanan, her xwendevanekî Welat dikare du Welatan bistîne; yekê jê bixwîne, ya din jî bide hevalekî (e) xwe.***

Dîsa jî, ji xwendevanên xwe ji ber vê paşdayîna pekanîna guherînên Welat, em lêborînê dixwazin.

Niha, problema me ya girîngtirîn belavkirin e. Ger em ji der heqê vê problemê de derkevin, wê rê li ber çareserkirina hemû problemên me yên din vebe. Tenê bila xwendevanên me hinekî din Welat bi kesên derdorên xwe jî bidin xwendin, serkeftin nêzîk e.

### NAMEYÊN XWENDEVANAN

Nameyên xwendevanên me, me pirr kêfxweş û dilgeş dikin. Lê hinekî din nivîs û nameyên xwe kurttir û fesîhtir binivîsandana, wê baştir bibûya.

Bi taybetî xwendevanên me yên ku li zîndanên dewleta Tirk dîl in, tevî ku pirr baş dinivîsînin û di warê nivîsandina Kurdî de gelek zû bi pêş dikevin, rêzên nivîsên wan pirr di zikê hev de ne û kaxezê ku li ser dinivîsînin santîmek cihê vala tê de nahêlin. Dema cihê vala li ser kaxez tune ye, em jî bi hêsanî nikarin nivîsên wan tashîh û sererast bikin. Ji mecbûrî em ji nû ve nivîsên wan dinivîsin. Gelek xwendevanên me jî çîrok an jî helbestên pirr dirêj ên bi destnivîseke pirr xerab nivîsandî ji me re dişînin û dixwazin em giş biweşînin, lê mixabin ev hem zêde wextê me distîne, hem jî rûpelên me têra wan nakin. Ji ber vê yekê ji kerema xwe re kurttir, fesîhtir û tenê li ser aliyekî kaxezê binivîsînin ji me re. Em li benda nivîsên we ne.

### JI HER XWENDEVANEKÎ(Ê) RE DU WELAT

Ger Kurd bi delalî nexwînin, emê bi zorê bi wan bidin xwendin. Wekî Kurdî zimanê me ye em mecbûr in lê xwedî derkevin. Wek gava yekemîn ji vê hefteyê û şûn ve em kampanyaya kirrîna du rojnameyan didin destpêkirin. Ji bo fêrkirina zimanê Kurdî û zêdekirina xwendevanan, her xwendevanekî Welat dikare du Welatan bistîne; yekê jê bixwîne, ya din jî bide hevalekî (e) xwe.

Bi vî awayî di demeke kurt de hem hejmara xwendevanên Welat wê hilkişe, hem jî hûnê piştgiriyeke girîng bidine Welat. Ev jî, wê rê ji me re veke ku em Welateke hîn xweştir, xurttir û geştir biweşînin.

Ji bo xwedî li zimanê Kurdî derketinê, ber bi pêş ve!

**Mazhar Günbat**

# Ji Yaşar Kaya re hezar sal ceza



*Ta niha 350 car ji Yaşar Kaya re doz hatiye vekirin*

**Navenda Nûçeyan–** Çima ku Yaşar Kaya li ser sûcdarkirina dadgehê neçû danişînê roja yekê Adara 1994'an heyeta dadgehê (mahkeme) re girtina giyabî derxistin.

Roja 8.3. 1994'an ji bo ku nivîsek di rojnameya Özgür Gündemê de derketibû û di der heqê wê de doz hatibû vekirin û Yaşar Kaya ne hazir bû, heyeta dadgehê careke din girtina giyabî ji bo wî da.

Wek tê zanîn, di der heqê xwediyê ronameya Ö. Gündemê û Yaşar Kaya de heta niha 350 carî doz hatine vekirin. Cezayên ku ji Kaya re hatine birin ta niha, 3 milyar pere û 1000 sal cezayê hepsê ne. Ji bo rojnameya Ö. Gündemê jî, ta niha 6 meh cezayê girtinê kifş bû ye.

Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê ya Enqereyê, 50 mîlyon ceza da Mehmet Bayrak, ku nivîskarê pirtûka "Stranên gelê Kurd."e

Nivîskar, li ser vê bûyerê diyar kir ku:" Berê ji bo pirtûkê doz hatibû vekirin û ji aliyê DED'ê ve, ev doz hatibû berat kirin. Biryara DED'ê ez pirr êşandim."

Rojnameya Azadî, hejmara 95'an ji aliyê DED'a Stebolê ve hate komkirin.

Berpirsiyarê Nivîsaran Cihangîr Aslan belavokek belav kir, di belavokê de wiha tê gotin: "Welatekî ku parlementerê wî nikaribin biaxivin, ji bo axaftina xwe bên binçavkirin, rojnameyeke welatparêz û demokrat li gor keyfa xwe kom bikin normal e.

Yên ku bibêje li Tirkiyeyê hiqûq heye, ew derewan dikin û xayîn in."

# Wê DEP'vanan yekî Fransiz biparêze

**Navenda Nûçeyan–** Abûqatê Fransiz Roland Dumas wê parêziya parlementerên DEP'ê yên ku muafiyeta wan hatibû hildan, bide ser xwe.

Wezîrê Karê Derveyî yê berê yê Fransayê Dumas, qerarê ku hatiye standin li gorî hiqûqa navneteweyî wê binirxine û lê bixebite ka çiqas biryar li gorî qanûnên Tirk in. Roland Dumas ku, qeydî baroya Parîsê ye wê bi abûqatên DEP'ê re bixebite û mijarê bibe saziyên navneteweyê ya Ewrûpayê.

Enstîtuya Kurdî ya Parîsê daxuyand ku, li ser daxwaza Leyla Zana Dumas nûnerîtiya mebûsên DEP'ê yên ku muafiyeta wan ji aliyê meclîsa Tirk ve hatiye hildan, ji bo bi xala 125'an a îdamê bêne mehkemekirin, qebûl kiriye. Ji Partiya Sosyalîst a Fransayê Wezîrê Karê Derveyî yê berê Roland Dumas, doza DEP'vanan wê bibe qadê navneteweyî û ji aliyê qanûnên Tirkiyeyê û hiqûqa navneteweyî ve lê binêre.



*Roland Dumas*

## *Li gorî rapora KMM'ê ya meha Reşemiyê:*

# 'Di mehekê de 17 gund hatin valakirin'

**Navenda Nûçeyan–** Rapora Komeleya Mafên Mirovan, a meha Reşemiyê roja 7'ê Adarê hate daxuyandin.

Li gorî vê raporê, rewşa Tirkiyeyê ji aliyê mafê mirovan ve her ku diçe xera dibe.

Rapor li ser binpêkirina mafên mirovan, di meha Reşemiyê de van agahiyan dide:

"16 kes di bin çav de bi awayekî nependî hatin kuştin, 29 kes winda bûn, li Kurdistanê 17 gund bi darê zorê hatin valakirin. 877 kes jî vê mehê de ketin binçav, 68 rojnameger û nivîsakar ji ber nivîsên xwe hatin girtin. 18 weşan hate berhevkirin û hêzên dewletê avêtin ser 3 komeleyan, partiyek (partiya kesk) hate dadan. Dîsa di vê mehê de, di dozên ku hatine vekirin de, ji bo mirovên nivîskar û rojnameger 664 meh heps û 1.05 milyar cezayê pere tê xwestin. Dadgehên Ewlekariya Dewletê, ji nivîskar û rojnmegeran re 109 mehî cezayê hepsê û 1.11 milyar cezayê pere birrîn.

Li gorî agahiyên rapora KMM'ê 39 kuştinên kiryar nediyar dîsa di vê mehê de pêk hatin û di bûyerên cur be cur de 34 mirovên sivîl mirin.

Rapor rexneyê li hildana muafiyata parlementeran û binçavkirina wan jî digire û wiha dibêje: "Dema mebûsan ji meclîsê biavêjin û dengê gel bibirin, nehêlin dîtinên xwe bînin ziman, demokrasî pêk nayê."

Rapor bibîr dixe ku, ev hikûmeta li ser navê pêkanîna hinek reformên demokratîk hatibû ser kar, lê dîmena welêt baş nîn e, ji ber vê yekê jî prestîja hikûmetê dadikeve.



*Roj namîne ku gundek li Kurdistanê nayê rûxandin.*

# Pest li zîndanan zêde dibe

Li Girtîgeha Amedê ya taybetî li hemberî girtiyên siyasî pesta dewletê, bi awayekî sîstematîk didome û zêde dibe. Li gor agahiyên ku girtiyên siyasî ji me re dişînin, di çûn û hatina mehkemeyê de polîs, leşker û gardiyan, ji lêdanê ta heqaretê, her cure îşkenceyê li hemberî wan bi kar tînin.

Li ser navê girtiyên siyasî yên Girtîgeha Amedê, Yilmaz Yürek û Latîf Çetîn, ji bo çapemeniyê daxuyaniyeke nivîskî weşandin. Di daxuyaniyê de pesta rêveberiya girtîgehê û amedekariya qetlîaman li hemberî girtiyan, tê îdîakirin. Li gorî wan di girtîgehê de, ji bo amadekariya provakasyonan rayedarên girtîgehê di nav hin xebatan de ne.

Daxuyaniya girtiyên siyasî ya ji bo çapemeniyê hatiye amadekirin, bi kurtahî vê dibêje: "Hin saziyên ku di bin raya kontrayan de ne, elemanên xwe (kontrayan) dişînin nav me û dixwazin bi "siyanurê" me jehr bikin û bibin sebeba qetlîaman."

Girtiyên dîl li ser raporên ku ji rêvebirên girtîgehê standine tê sekinin û dibêjin ku ev rapor bi serê xwe ji bo îşkenceyê belgeyek e.

Nûnerên girtiyên siyasî didin zanîn ku, wan ev yek (kirinên rayedarên girtîgehê û pesta polîs, leşker û gardiyanan) ji serdozgerê Komarê Fahrî Kasirga re jî gotine. Li gorî wan, serdozger jî bersiveke pozîtîf nedaye wan û wiha bersiva wan daye: "Hûn bûyerên ku li herêmê (Kurdistanê) çêdibin, dizanin, tiştekî ku, ez karibim bikim tune." Nûnerên girtiyan tînin zimên ku ev pes wê di rojên pêş de jî bidomin.

Nûnerên girtiyên siyasî li ser van êrîşan bala rayedarên girtîgehê dikişînin û vê dibêjin: "Di 7'ê Adarê de deh hevalên me di çûn û hatina mehkemeyê de, bi lêdan û îşkenceyan ji gelek cihên xwe birîndar bûn. Heke ku ev pest û lêdan bidomin em jî, ji bo protestokirina van kirinan dernakevin mehkemeyan."

# Li Girtîgeha Bûcayê jî greva birçîbûnê

Li Girtîgeha Bûcayê girtiyên ji doza PKK'ê, berî hefteyekê dest bi greva birçîbûnê kirin. Li gorî girtiyan, rêveberiya girtîgehê, dixwaze hin girtiyan bikin îtîrafkar. Ji ber vê yekê, girtiyên siyasî yên ku îtîrafkarî qebûl nekirine, ji aliyê rayedarên girtîgehê ve, sirgûnî Girtîgeha Nazîlliyê kirine.

Rayedarên girtîgehê jî li ser vê sirgûnê îdîa kirin ku, ew kesên hatine sirgûnkirin, girtiyên îtîrafkar in. Maliyên girtiyên siyasî ev îdîayên rayedarên girtîgehê nerast rê dan.

Rayedarên Girtîgeha Bûcayê, ji bo berxwedana girtiyan bişkînin, hevdîtina ku ji hefteyê carekê çêdibû, deranîn ji 15 rojan carekê.

Ji hêla din ve girtiyên ku sirgûnî Nazîlliyê bûne jî, ji 10 rojan carekê û bi dorê, dest bi greva birçîbûnê kirine.

# Ji bo mebûsên DEP'ê greva birçîbûnê

Girtiyên siyasî yên girtîgehên Îskenderûn, Bursa û Aydinê, ji ber binçavkirina mebûsên DEP'ê dest bi greva birçîbûnê kirin.

Girtiyên Girtîgeha Îskenderûnê, ji bo protestokirina vê biryara rakirina mûafiyeta mebûsan û binçavkirina wan, ji bo 6 rojan dest bi grevê kirin.

Girtiyên Girtîgeha Bursa jî wê 6 rojan (ji 10'ê Adarê) vê grevê bikin. Di Girtîgeha Bursayê de girtiyên PKK'ê, HDÖ'yê û PDK Hevgirtinê dê beşdarî vê grevê bibin. Ji hêla din ve di Girtîgeha Çanakkale, Aydin û Bursyê de jî, girtiyên Dewrîmcî Solê, ji bo 3 rojan dest bi grevê kirin. Li Stenbolê, girtîgeha Sağmalcilarê de jî girtiyên TKEP/L'ê ji, bo vê sebebê 3 rojan dest bi greva birçîbûnê kirin.

# Peymana Îsraîl û Filîstîn kete xetereyê

*Kovara Newsweek'ê bi Serokê RRF'ê Yaser Arafat û Serokwezîrê Îsraîl'ê Îzak Rabîn re li ser domana aştiyê, piştî qetlîama El-Xelîl'ê heypeyvîn çêkirin, bi baweriya ku wê bala we xwendevanên hêja bikişîne, em wan hevpeyvînan li Kurdî werdigerînin û pêşkêşî we dikin.*

*Gelo hûn amade ne ku vexwendina Serok Clînton ya Washîngtonê, ji bo destpêkirina guftûgoyên aştiyê bipejirînin?*

– Em ji bo vê vexwendinê spasdar in, lê hêja em li benda hinek gavên berbiçav in, ku ji aliyê Hikûmeta Îsraîlî û Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî ve bên avêtin, ji bo ewlekarî û fireqetiya gelê me.

*Hûn li benda hêzên aştîparêz in, ku bên hemû deverên dagirbûyî?*

– Belê, hemû cihên dagirbûyî. Ev xal di nav Deklerasyona Prensîban de jî cih digire, lewre em ji bo ku gelê xwe ji qetlîaman xelas bikin, naçin li ser heyvê, li tu hêzan nagerin.

*Tiştekî wisa di nav peymana ku we îmzekirî de tune, hûn dê kengî û di kîjan rewşê de bibêjin: "Em ji bo destpêkirina guftûgoyên aştiyê amade ne?"*

–Deklerasyona Prensîban kada (behsa) hêzên navneteweyî dike, ka li ku derê dibêje, bila ew hêz bêçek bin? Piştî vê qetlîamê wê kî gelê me biparêze? Gelê me wê ji aliyê niştecihên cihû, yan artêşa Îsraîl ya ku di vê qetlîamê de cih girt ve, bê parastin? Ez îdîa dikim ku hinek rayedarên artêşa Îsraîlê di vê bûyerê de cih girt.


*Gelo rast e, heyeta we ya ku çûbû Washîngtonê, ji rêveberiya Clînton xwestiye ku, alîkariya ji koçberên cihû re tê şandin, were birrîn?*

– Erê. Pereyê tundxwazan giş ji Brooklynê diçe. Lê ji bilî xwestina vî tiştî, tiştek ji destê me nayê.

*Rabîn hinek cezayên îdarî dan wan tundxwazan û çeper li wan teng kir...*

**EZÊ JI GELÊ XWE RE BIBÊJIM EZ HATIM XAPANDIN**

*Cara yekemîn e ku mirovên hêrsbûyî wêneyê min diçirînin, piştî qetlîamê. Belê, cara yekemîn e ku tiştekî wisa diqewime. Ê Rabîn tenê dijraberekî wî heye, "Lîkut." Lê ez ji her alî ve têm rexnekirin. Ez ji destpêkê ve bergidana aştiyî didim.*



– Wê kî garantiyê bide min û gelê min, ku wê qetlîamên din çênebin? Slogan? Divê hûn hêrsa mirovên me, mirovên Ereb û miletên misilman bibînin (fêm bikin). Ji bo me hêzên aştîparêz yên navneteweyî, daxwaza bingehîn e.

*Rabîn vê daxwazê qet napejirîne...*

– Mafê wî tune ku bibêje na. Mafê wî tune ku veto bike. Ev der ne erdê Îsraîlê ye, malê me yî heq e. Ji bîr neke, kesê ku pêkanîna planê bi derengiyê xist Rabîn bû. Di dawiyê de em rastî qetlîaman hatin. Hûn dizanin ji bûyera El-Xelîl vir de çend Filîstînî hatine kuştin? 33 kes, belê bi destê artêşa Îsraîlê 33 kes hatine kuştin.

*Rabîn jî qala 33 Îsraîliyên ku ji meha Rezberê (Îlon) vir de hatine kuştin, dike.*

– Ez tenê kada van 8 rojên dawî dikim. Leşker û niştecih bi hev re dixebitin. Di peymanê de tê gotin ku wê niştecih ji aliyê leşkeran ve bên parastin, lê niştecih wek artêşeke taybetî, hêzeke sêyemîn kar dikin.

*Hûn hêvî dikin ku Amerîka alîkariya we bike?*

– Ez bi vê gotinê xemgîn im, lê na.

*Hûn bêhêz xuya dikin, hûn dê çi bikin?*

– Heke hûn difikirin ku ez bêhêz im, ev xeletiyeke mezin e.

Ez dê derkevim kuçe û kolanan, ji mirovên xwe re, ji gelê Filîstînî re, ji Ereban re û ji miletên misilman re bi dilekî vekirî û bêderew bibêjim, "Ez hatim xapandin" û li encamê binêrim. Ev jî, ji bo min bes e.

*Hûn bawer in, ku hûn hatine xapandin?*

– Belê. Piştî şeş mehan, ji ahenga Birca (Qesra) Spî vir ve tiştekî ku pêkhatiye li holê tune. Me şeş mehan ji bo ewlekariya niştecihên herêmê gengeşî kir. Niha derdikeve holê ku, hewcedarê ewleyiyê, Filîstînî ne.

*Rabîn jî xwe avêt talûkeyê, heta wek xayîn jî hate binavkirin.*

– Lê ji bo min çi gotin? Cara yekemîn e ku mirovên hêrsbûyî wenêyê min diçirînin, piştî qetlîamê. Belê, cara yekemîn e ku tiştekî wisa diqewime. Ê Rabîn tenê dijraberekî wî heye, "Lîkut." Lê ez ji her alî ve têm rexnekirin; ji aliyê muxalefeta Ereb, ya îslamî, ya Filîstîn û ya File ve. Piçekî dadmend be (bi însaf be). Ez ji destpêkê ve bergîdana aştiyî didim.

*Lê ji bo Rabîn jî ne hêsan e, êrîşên terorîst hene, heta niha 30 keşên Îsraîlî hatine kuştin...*

– Ma em heywan in? Belê, em heywan in? Heywanên Filîstînî ne ku hûn li çendekê miriyên me nanêrin.

*Lê heke wek hûn dibêjin, mirovên we li hemberî we serî hildidin û Rabîn jî nikare artêşa xwe kontrol bike. Ev tişt nayê vê wateyê ku divê hûn herdu alî jî, bi lezgînî aştiyê pêk bînin?*

– Ê ku pêkanîna planê bi derengiyê xist, ne ez bûm û hêza dagirker jî ez nîn im.

*Niha Rabîn qala kurtkirina demajoya pêkanîna aştiyê dike, lê hûn?*

– Pêşî pêdiviya me bi garantiyê heye, ji bo fireqetiya gel.

*Wê êrîşên tolhildanê çêbin?*

– Ez hêvî dikim na.

*Hûn hêvî dikin...*

– Ez henekan nakime, ez bi rastî jî aştiyê dixwazime, lê divê her kes bizanibe ku aştî ne pêdiviya me Filîstîniyan tenê ye.

*Li gorî dîtina we, wê kengî guftûgoyên aştiyê ji nû ve dest pê bikin?*

– Ez nikarim bersiveke rasterast bidim, bêguman qetlîama Hebron (El-Xelîl)'ê hinek problem çêkirin. Lê (ez karim bibêjim) ji bo pêşerojê tenê li pêşiya me riya çareseriya polîtîk heye.

Ku carê li ser merheleya yekemîn lihevkirin çêbû, êdî pêkanîna vê planê (wek ku di peymanê de tê gotin) 4 mehan nagire, wê di 6 heftiyan de çêbe. Ez hêvîdar im, wê Filîstînî nehêlin ku ev kujyarê hov yê cihû bigihêje armanca xwe. Ew kes ne ji bo kuştina Filîstîniyan çû vî cihê pîroz, lê ji bo pêkanîna doza xwe ya siyasî çû wê derê, ji bo kuştina li hevkirinê û aştiyê çû. Ez hêvî dikim serokên Filîstîniyan têbigihêjin ku, navberdayîna domana aştiyê wê zêdetir probleman derxe.

*Bertek (reaksiyan)'a we li dijî hewldana RRF'ê ya ji bo temîn kirina hêzên navneteweyî yên aştîparêz, (ji bo parastina Filîstîniyan) çi ye?*

**DIVÊ TUNDXWAZ NEGIHÎJIN ARMANCA XWE**

*Ew kes ne ji bo kuştina Filîstîniyan çû vî cihê pîroz, lê ji bo pêkanîna doza xwe ya siyasî çû wê derê, ji bo kuştina li hevkirinê û aştiyê çû.*



– Di peymanê de qala alîkariya hêzên navneteweyî tê kirin, lê yên bêçek, ji bo ku alîkariya aborî ya Filîstîniyan bikin. Divê mirov bala xwe bide sereta (prensîb) yên bingehîn. Em girêdayê hemû xalên ku li ser me lihevkiribû ne, em dê hemû wadên ku me dane bîrîn cih, em ji Filîstîniyan jî vê yekê hêvî dikin. Dema peyman hate îmzekirin divê mirov girêdahiyê wê be.

Li herdu aliyan jî bûyerên erjeng çêdibin û hinek rêxistinên ku aştiyê naxwazin hene, lê divê mirov nehêle ku ev kes rê li ber vê pevajoyê bigirin û bigihêjin armanca xwe.

*Hûn dê çawa niştecihên tundxwaz yên cihû kontrol bikin, tê gotin ku pirraniyan van kesan ji DYA'yê hatine, hûn dê riya hatinê li ber wan teng bikin?*

– Qasî ku qanûnên me rê bidin, em dê nehêlin ku ew bên, lê pêşî divê em kesên li hundir (Îsraîl û herêmê Filîstîniyan) bigirin bin kontrola xwe. Kesên li herêmê ne em nahêlin ku biçin Hebron'ê. Dîsa kesê ku li Hebronê ne em nahêlin biçin wê perestgehê û çekên ku di destê tundxwazan de ne em dê jê bistînin. Ji ber ku heta niha hawldanên me yên darizandina wan kesan negihîşt encameke baş, em dê cezayên rêveberî (îdarî) bidin pêşnengên wan.

*We dil heye, ku hûn niştecihên cihû derxin derî Hebronê?*

– Hîn tu biryarên bi vî rengî nehatine standin. Peymana aştiyê dibêje ku, tu niştecihên cihû divê di dema awarte de ji cihê xwe nebe. Mafê RRF'ê nîn e ku vî tiştî ji me bixwaze.



*Jinên panelîst rewşa xwe anîn ziman û ji jinan xwestin ku bi awayekî rêxistinî ji vê rewşê xelas bibin.*

# Li DEP'a Avcilarê panela jinan çêbû

Bi nêzîkbûna 8'ê Adarê, Roja Jinên Kedkar ên Dinyayê, çalakiyên jinên pêşverû jî zêdetir bûn. Roja 6'ê Adarê li DEP'a Avcilarê panelek çêbû. Kesên ku wek panelîst beşdarî panelê bûbûn, ev kes bûn: Seroka Komîsyona Jinan a DEP'a Bajêr Sakîne Ateş, Seroka DEP'a Avcilarê Bîrcan Öztürk, Seroka Komîsyona Jinan a KMM'ê Ebûqat Nesîn Ulutürk, Berpirsiyara Nivîsaran a Kovara Özgür Kadin'ê (Jina Azad) Nîl Apuhan û ji Rojnameya Özgür Gündemê Yurdusev Özsekmenler. Hejmara kesên beşdar ji, 300 kesî zêdetir bû. Berî ku panel dest pê bike, ji bo giramgiriya şehîdan (bi taybetî yên jin) beşdar kêliyekê li ser piyan rawestiyan, beşdaran di vê demê de bi yek dengî Marşa Neteweyî "Ey Raqîp" xwend.

Panelîst bi taybetî li ser pirsgirêkên jinên kedkar, jinên hem li karistanê, hem jî li malê ji aliyê mêran ve tên perçiqandin, rawestiyan. Gerîlaya jin wek mînaka jina ku ber bi azadiya xwe ve dimeşe hate nîşandan. Di panelê de hate gotin ku, divê jin gav bi gav kend û kospên li pêşiya xwe rakin û bi rêxistin bibin. Helbesteke ku ji aliyê jinekê ve, li ser gerîlayên şehîd, bi Kurdî hate xwendin, gelek bala beşdaran kişand ser xwe.

Panel bi pirsên beşdaran ên li panelîstan û bersivên panelîstan ve qediya.

**Cewdet Kuşman**

*Şevên DEP'ê yê dostanî û piştgiriyê didomin*

# DEP'a Kağithane li Pembe Köşkê bû

**Salîh Günbat**
**Hîdayet Günbat**



*Hasan Sîncar*



*Alî Riza Dîzdar*



*Dr. Kemal Parlak*

DEP'a navçeya Kağithaneyê roja 5.3.1994'an şevek bi navê "Dostanî û Piştgiriya DEP'ê" li salona Pembe Köşkê çêkir. Ji xeynî misafiran, nêzî 3 hezar kes beşdarî şevê bûn.

Şevê bi axaftina serokê DEP'a Kağithaneyê Hasan Sîncar dest pê kir. Sîncar di axaftina xwe de wiha got: "Ji bo ku mirov durûtiyên partiyên din bibîne pêwist nîn e ku kahîn be. Jixwe partiyên din jî, ne muhatabê me ne. Muhatabê me Serleşkeriya (Genelkurmay) Tirk e, di vê hilbijartina ne durist de, em nabin piyonê dewletê."

Hasan Sîncar li ser rewşa Kurdistanê jî rawestiyar diyar kir ku ta niha ji aliyê dewletê ve 900 gund hatine şewitandin, valakirin, koçeberkirin û bi hezaran însan hatine kuştin, niha jî bi hezaran endam û berendamên DEP'ê girtîne, an jî di bin çav de ne. Sîncar îddîa kir ku ji ber ku DEP nakeve hilbijartinê, yek endamê wan jî rayên xwe nadin partiyên din.

Di şevê de berendamê Serokatiya Belediyeya Kağithaneyê Alî Riza Dîzdar bangî temamî şoreşger, demokrat û pêşverûyan kir ku, di nava DEP'ê de cihên xwe yên bi rûmet bigirin û di nav partiyên paşverû de nemînin.

Dîzdar: "Piştî hewçend pest û pêkûtiyê, partî û çapemeniya dewletê li ser me hene jî emê dîsa bikenin. Em vê yekê ji wan re bibêjin, 'Berekên ku hûn berdidin me, emê bikin gul û pêşkêşî we bikin.' Alî Riza Dîzdar axaftina xwe wiha qedand: "Gelî partiyên sîstemê hişê xwe bînin serê xwe, di dawiya dawiyê de emê dersa demokrasiyê jî bidin we!"

Ji bo xortan jî wiha got: "Divê hûn wek şêr û pilingan bi hêz û quwet bin, lê wek xezalan jî nekevin dest."

Alî Riza Dîzdar di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Mirin ji kur ve û bi çi awayî tê bila bê, li ser seran û li ser çavan."

Serokê DEP'a Bajêr Dr. Kemal Parlak jî gazinên xwe ji dewletê kir. Parlak: "Dewletê niyeta me ya baş xerab bi kar anî û bû sedemê vekişîna me ya ji hilbijartinê. Partiya me temamî amadekariyên xwe li gorî ku wê beşdarî hilbijartinê bibe kiribû. Lê bi bombekirina navenda partiya me û van qetlîamên dawî, em mecbûrî nebeşdarbûna hilbijartinê kirin.

axaftina xwe bi vî rengî domand:" Rûreşiya dewletê eyan beyan li holê ye. Dewlet nêzîkî çereserkirina siyasî nabe. Wek ku mirin tenê para gelê Kurd be û bi destê leşkerên Tirk bêne kuştin."

Di şevê de gotinên axêvkaran de, gelek caran bi sloganên, "Bijî Serok Apo, Bijî PKK, Her bijî Partiya Gelan, Kurdistan dê ji faşîzmê re bi goristan:" û hwd. hatin qêrîn.

Hunermendên ku beşdarî şevê bûbûn ev in Hozan Ganî Nar, Koma Çiya, Koma Amed, Fevzî Kurtuluş û Folklora Navçeya Kağithaneyê Koma Evîndar.

*Serokê DEP'a Bajarê Stenbolê Kemal Parlak:*

# 'Ew ji demokrasiya me ditirsin'

**Bayram Nêrgiz**



*Dr. Kemal Parlak*

Rêxistina DEP'ê ya navçeya G.Osmanpaşayê şevek bi navê Dostanî û Aştiyê li G.Osmanpaşayê li "Beyazgül Düğün Salonu"yê, di 5'ê vê mehê de li dar xist.

Şahî bi axaftina Serokê navçeya DEP'a G.Osmanpaşayê Hidir Doğan vebû. Hidir Doğan: "Em xebatên xwe yên siyasî didomînin. Partiya Demokrasiyê partiya hemû gelan e, deriyê me ji her kesî re vekirî ye. Em pesta li ser mebûsên xwe bi nefreta xwe protesto dikin."

Serokê Giştî yê Bajarê Stenbolê Dr. Kemal Parlak di xeberdana xwe de rexne li kirinê dewlatê kir û wiha got: "Dewlet dibêje ku, li Tirkiyeyê demokrasî heye. Ma dewlet bi van gotinên xwe şerm nake. Ku demokrasî hebe çawa heftê endamên Partiya Demokrasiyê tên kuştin, çawa Navenda Partiya Demokrasiyê ya Enqereyê tê bombekirin û mufiyeta mebûsên me ji wan tê standin. Ev e demokrasî? Ev dixwazin me bitirsînin. Lê em natirsin û tu tiştî xebata me ya demokrasiyê nikare bide sekinandin. Em dê xebata xwe bidomînin da ku em vê rejîma kotek û zordar daxînin."

Ji rêveberên DEP'a Bajarê Stenbolê Şemsettîn Kara: "Gelî dostan, li Tirkiyeya demokratîk zagonên demokratîk tên bikaranîn. Ji ber vê yekê Partiya Demokrasiyê ji hilbijartina 27'ê Adarê dane vekişandin. Ji ber vê yekê bombe li ser serê me dibarînin, mebûsên me digirin, dixwazin partiya me radin. Dixwazin partiya me radin, ji ber ku Partiya Demokrasiyê, di demokrasiya rastî de dê dagirker û kedxwaran ceza bike. Hingê Tansu xanim wê milyarên xwe li ku veşêre, ji ber vî awayî, demokrasiya rast naxwazin. Lê ew jî dixwazin bibin demokrat."



*Şemsettin Kara*

Bîlgesu Erenus jî di şevê de bi giranî li ser roja jinan axifî û wiha got: "8'ê Adarê roja jinan e, ez ji niha ve hemû jinan pîroz dikim. Bi taybetî ez roja jinan li mebûsa jin Leyla Zana ku niha di binçav de ye pîroz dikim. Ez vê rojê li Berpirsiyara Giştî ya Rojnameya Özgür Gündemê Gurbetellî Ersöz ku, niha di girtîgehê de ye û li rojnamevana Özgür Gündemêê Aysel Malkaç ku niha jê agahî nîn e pîroz dikim.

Şahiya DEP'a navçeya G. Osmanpaşayê bi beşdariyeke mezin û bi programeke xurt hate pê. Di şevhe de Koma Amed, Ganî Nar, Bîlgesu Erenus, Grup şahmaran, Koma Serhildan û Şanogerên ji Atolyeya Özgür sanat'ê.

# Li Ewrûpayê 'demokrasiya' Tirkiyeyê baş tê nasîn

**Yekda Welat**

"Tirkiyeyê mebûsên Kurd ji parlementoyê dibe û dike girtîgehê. Serokê Parlementoya Almanyayê Tirkiyeyê protesto dike. Mîtterrand li ser girtina mebûsên DEP'ê ne bi kêf e. Mebûsên Partiya Yekîtiya 90/ Keskan li dijî êrîşa li ser DEP'ê derdikeve. Sosyaldemokratên Almanyayê ji dewleta xwe dixwazin ku, li ser rewşa Kurdên li Kurdistanê raweste, mebûs ji Fransayê diçin Tirkiyeyê." Ev hinek ji sernivîsên rojnameyên Ewrûpa yên li ser girtina mebûsên DEP'ê, bûn.

Çiqas dewleta Tirkiyeyê gavên li dijî têkoşîna gelê Kurd, an jî li dijî demokrasiyê diavêje, derbe li xwe dixe. Êrîşên artêşa dewleta Tirk ya li ser Baregeha Zelê, jê re bû kemîn di dîplomasiya cîhanê û civînên navneteweyî de. Qedexekirina PKK'ê li Almanyayê moral û hêza gelê Kurd bilind kir. Li Ewrûpayê Kurd ji berê zêdetir piştgiriya PKK'ê dikin. Komeleyên Kurdan rêxistinên xwe pirrtir organîze dikin, demokratên Alman, Fransa, Îngîltereyê û hwd. niha eşkere piştgiriya xwe ji bo PKK'ê û têkoşîna wê, diyar dikin.

Bi girtina mebûsên DEP'ê niha çavên herkesî li "demokrasiya" Tirkiyeyê ye. Heta partiyên kevinperest jî niha li Ewrûpayê dibêjin: "Li ser konevaniya Tirkiyeyê divê em çêtir rawestin."

Mîtterrand û Helmut Kohl li ser girtina mebûsên DEP'ê û rewşa Kurdistanê diaxifin. Ewrûpa di parlemento û komîsyonên xwe de pirsgirêka Kurd û Kurdistanê dixe rojeva xwe. Bêguman girtina mebûsên DEP'ê hêjayî 2 milyar dolarî ye ev qas zirar li aboriya Tirkiyê xist. Piştî vê bûyerê hezaran tûrîst xwe ji çûyîna Tirkiyeyê bi paş ve dikişînin. Li Berlînê di wan rojan de şanbazara tûrîzmê heye û hejmara mirovên ku dixwazin herin Tirkiyeyê kêmtir dibe. Li şûna axaftina li ser cih û warên xweş û sipehiyên li Tirkiyeyê, her kes li ser tunebûna demokrasiyê diaxife.

Dîplomatên Tirkiyeyê li Ewrûpayê ketine tengasiyeke mezin, serokê dewletan wan vedixwînin û dixwazin li ser vê bûyerê agahdar bibin. Di wan axaftinan de ev dîplomat nizanin çi bersivê bidin.

Bandora heyetên DEP'ê ku beriya mehekê hatibûn Ewrûpayê, xuya dike. Serokên dewletên Ewrûpayê li ser meseleya Kurdan baş têgihîştine û dizanin rista Kurd û Kurdistanê ji bo mafên wan çi ye. Lewre dewletên Ewrûpayê dixwazin li gorî xwe havilekê ji bo Kurdistanê bibînin.

Di wan rojan de tenê li Almanyayê nêzîkî bîst civînên biçûk û mezin li ser rewşa Kurdistanê û girtina DEP'ê çêbûn û her dem gelê Alman pirsa li ser PKK'ê û armancên wê û çareya pirsgirêka Kurdistanê dipirsin. Derfetên mezin ji bo dîplomasiya Kurdistanê çêdibin, deriyên girtî vedibin. Dîplomasiyên Tirkan diçin ku derê derî li ber wan tên girtin.

Dewletên împeryalîst têgihîştibûn ku dewleta Tirk êdî nikare ji bo împeryalîzmê Rojhilata Navîn kontrol bike û fermandariya Pergala Nû ya Dinyayê li Rojhilata Navîn bimeşîne, lewre jî împeryalîzm di planên duduyan de bi koteki Îsraîl û Filîstîn gihandin hev, da ku Îsraîl delameta Tirkiyeyê bike. Bi Îsraîlê împeryalizm dixwaze li ser hîmên aborî, teknîkî û konevanî dewletên Ereb, bi awayekî veşartî bike bin destê xwe. Serokê Îsraîl Weizman jî ne bêsedem di wê demê de hate Tirkiyeyê. Bi berxwedana gelê Kurd û rêberê wî PKK'ê, Tirkiyeyê di nav refên împeryalîzmê de dereceya xwe ya berê winda kiriye. Rista Tirkiyeyê wek berê ne girîng e.

Bi azîneyên antîdemokrat, dîktatorî û faşîstî dewleta Tirk dixwaze qirkirin û hingavtinên xwe yên li dijî gelê Kurd, legal bike. Bi gotina mebûsên DEP'ê konevaniya xwe ya paşverû legal dike û dixwaze ku vê metodê bi awayekî fermî di nav sîstema dadmendî ya bingehîn de bi cih bike. Çawa ku dewlet mirovan bêsûc (tawan) digire îlegalîteyê legal dike. Çawa hingavtin (işkence) aletekî dewletê ye û çawa wêrankirina gundan, kuştina mirovan, talankirina welatekî xaleke konevanî û dadmendiya Tirkiyeyê ye, wiha dixwaze girtina nûnerên gel, legal bike.

Alternatîf ji me re çi ye? Alternatîf tenê rizgarkirina mirovahiyê ye.

Lewre jî dewleta Tirk çi gavî biavêje jî jê re xedar e. Bi zor û kotek, bi hovîtî û barbarî giyana serxwebûn û azadiyê tu car nehatiye wêrankirin.



*Binpêkirina mafên mirovan ji aliyê hêzên leşkerî yên dewleta Tirk ve li Ewrûpayê jî, bi nav û deng e.*

# Tirkiyê de demokrasî

Nêbeno, nê hûrdmina çî yewbînî ra zaf dûrî yê. Serbetake koledaran demokrasî xorê kesîtiye karekter û moral nêkerdo. Tirkiyê de jî demokrasî nêbeno yan jî hûnde beno. Yew welat bifikirê, ê welatî de yew hukmat, rojnaman û serde jî rojnamevanan bifikrê, ke mevacê no çî, na na derheq de şaş o, rind niyo, huqukî niyo, hurêdiya naye de vacê, serbeta ke Avrupa de, Almanya yan jî Fransa de şar ma ra rinde nêvano, şar na çiya hemverê ma xebetneno, ganî ma na çiya mekeme, heke keme jî ganî rind yan jî "şik" bikeme.

Partiya hukmatî civîna gruba xo de –be zagon– derhê mebusanê DEP'ê de şikîna qese bikero û Xatûna Çillere, hemwelatiya Amerika û muslumana newiye, a bi xo jî cewranê xo de çepla dana we û serba H. Dicleyî vanâ "xayîn".

Qêyî? Serbeta ke H. Dicle û hevalanê xoyê bînî bîr û bawariya xo vanê, rayştê vanê, ze Silê Şuyanî, ze Xatuna Amerikî, ze Hîkê Lîce nêvanê û qese nêkenê. Ebi metodanê Goebelsî xebetîne. Hemverê Kurdan, partiyanê dînan, roşnabîranê dînan, kesanê dînan propogandaya siyaye kene. N. Menteşe ze Goebelsî, Medya ze hemverê Cuhudan demê Hîtlerî de, parlamento ze "Rechstag"î ebi koploya, polosî ze zebaniya, Mahkemê Şeveknayena Dewlete (DGM) ze hukmatî xebetînê. Kes nêzano destê kamî cevê kamî de ro.

Welat, hukmat, rojnamevanî û şaroke demokrasî, laîsîzm, edelat û huquk ne serba xo û serba kesanê xo biyaro ca, la belê serbeta ke wa dewlet û hukmatê bînî vacê; "Hêya no welat yan jî hukmat demokrat o" biyaro ca, no şermêde zaf girs o. Ez bawer kena no şerm jî layiqê na dewlet o û na jî nêşikîna binê nêra veciyo.

Serba nayê berbenê, serba nayê danê xoro, serba nayê destê xo kewtê pêsîrê xo, ne ke serba mordem û mordêti ye, serba heq û heq e.

Çimke dinya biya qij e, Kurda dinya kerda qij e, şorê kotî Kurd û dostê Kurdan estê. Dem ne ze demê Koçgirî, Şêx Seîd yan jî Dersîmî yo. Dem demê Kurdan o, dem ronesansê Kurdan o. Dem ne o dem o ke, Kurdî bêziwan bî, verê mahkeman de, verê hakim û sawciyanê koledaran de vilê xo kerdêne çewt, xo efkerdene waştenê, dem demê sereberzkerdena Kurdan, roşnabîran û mebusanê Kurdan o. Çiyê de bê mana wo, demokrasî ebi Tirkiyê, la belê serê hardan de qe yew ziwanî de mana demokrasî ze mana demorasî ebi Tirkiyê niya.

Bingepersê demokrasî ebi Tirkiyê ze lastik yo, kata oncema bonce. Keyfiyet o, zilm o, zor o, bindestî û qedexekerden a, tolazî û serxoşiya şovenizmî yo. Bawariye de, fikir de, qesekerdene de sînor o. Sînorê dê şimşêr, tank û topê generalan o. Ters o, kortî ya, nêdiyen a. Nasnêkerdena zagonan, qanûnan, huqîk û edeletî yo. Hêra çima wo, îşkence wo, qetliyam o, sirgûn o. Cayê dê Wertê lewanê generalan de ro. Kes nêşikîno cireso, kes nêşikîno cira fam bikero. Teyna koledarî, general û brokratê dînan şikînê dê resê û cira fam bikerê. Kurmanc û şarê Kurmanciyê qe nêşikînê nêzdi ra derbaz bê.

Televiziyonê Tirkiye de yew reklam bî vatêne, "Esas de çîna ferqa ma yewbînî ra, la belê ma Banka Osmaniya me". Halê Dewleta Tirkî, bi înstîtutanê xo, bi partiyanê xo, mahkemanê, bi medya xo, bi rojnamevananê xo, ze cumla corî yo. Ferqa kesî kesî ra çîna. Dewlete biya dewletа polosan, hukmat biyo hukmatê generalan, parlamento û partî qe wayirê yew fonksiyonê taybetî niyê.

Bêguman mordem nê çîmiya pêrîne ra dime şîkîno vaco: "Koledarî dawiyê de ya ebi nê şermê xo şonê binê hardî û yan jî ebi nê şermê xo şonê binê hardî", rayêde bîne çîna.

**Lerzan Jandîl**

*Banga Hereketa Îslamî ya Kurdistanê*

# Li hember polîtîkayên hov derkevin

Hereketa Îslamî ya Kurdistan bi rasthatina Cejna Remezanê bangek ji bo gelê Kurd ê misilman û raya giştî ya dinyayê weşand. Bang bi kurtî wiha ye.

"Ji dema Hz. Pêxember heta îro hemû misilman di piştî meha rojiyê de Îda (cejna) Remezanê bi gelek kêf û şahiyan ve pîroz dikin. Alema îslamê di van rojan de wê Îda Remezanê pîroz bikin, lê belê gelê Kurd hem li welatê xwe Kurdistanê, hem jî di nav sînorê dewleta Tirk de jî vê dilgeşî û şahiyê mehrûm û bêpar e.

Lewre rejim û sazûmana Tirkan a zalim û hov, zor, tahde û qetlîameke wilo li Kurdistanê çêkiriye ku, ji ber girî û zarîna zar û zêçan, pîr û kalan, fîzar û fîganên girtiyên heps û zîndanan, malbatên ji gund û bajarên hatine koçberikirin, reben û perîşan bûne, li der û dertûlan, tu tam û xweşî ji îdê re nehiştine. Pirrî malbatên Kurdan yan şehîdên wan hene, yan jî girtiyên wan. Zêdetirî wan jî, di dilê wan de tirsa ku wê çi wextê tîm, esker yan jî kontr–gerîla biaveje ser mala wan, wan bigirin, bikujin û biavîjin heps û zîndanan heye.

Gelê Kurd aştîxwaz e, şer û cengan naxwaz e. Lê mixabin şer û ceng lê hatine barkirin. Îro li ber çavê hemû dinyayê zilm û zorek bi ser de hatiye, ku cunta kemalîst a bêdîn, ne dibêje zarok, ne dibêje zêç, ne kal, ne pîr, ne mêr, ne jin, destê xwe yê qirêj dirêjî her kesî dike. Bi kêf û xwestina dilê xwe qet çavê xwe nagire, dikuje û diperçiqîne. Deng ji tu kesî nayê.

Em gazî hemû aştîxwazên dinyayê, alim û zanyar, xetîp û waîz, nivîskar û rêzan dikin, ku gavek baş biavêjin, li hemberî vê polîtîkaya Tirkan a çewt û hov derkevin.

Em ji Xwedê dixwazin ku, rojekê zû domahîk li vî şerê qirêjî ku di navbera herdu birayan (gelê Kurd û Tirk) de diqewime bîne.

Ev Îda Remezana mubarek ji hemû însanan re, ji alema îslamê re bibe wesîla huzur û rihetiyê, aştî û biratiyê. Em îda we pîroz dikin, hûn gelek îd û cejnan bibînin."

**Neqtik**

*Têkoşîn jinê azad dike*
*Azadbûn wê bedew dike*
*Bedewbûn jî wê dide hezkirin.*

***Abdullah Öcalan***

**KÊ ÇI PEKAND?**

**Bila Rojava (Ewrûpa) li karê xwe binêre. Tirkiye welatekî serbixwe ye!**

*Süleyman Demîrel*
*Serokkomarê Komara Tirkiyeyê*

*Pêkenokên gelêrî*

# Min tiştek ji vê dinyayê fêm nekir

Yekî kal bi misilmaniya xwe ve hişkebend girêdayî bû û tim taeta olî dikir, haya wî ji dinyayê tune bû. Mirovekî di halê xwe de bû. Lê çendakî malî û cînaran nêrtin ku "Kalê delal" dev ji nimêj, rojî û taeta xwe ber daye, tu taeta olî nake. Malî û der û cînar li kalo şaş dimînin, ku kalê 70'ê salî çawa dev ji nimêj û rojî ya xwe berdaye. Hew hedan dikin û ji Kalo dipirsin:

"Kalo! Xwedê jê razî, te çima dev ji rojî, nimêj û taeta xwe berda piştî vî temîneya (umir) xwe?"

Kalo: "Welle lawo min tiştek ji vê dinyayê fêm nekir. Min taet kir nebû, rojî girt nebû, 5 ferz nimêj kir nebû, 5'ê din min danî serê nebû. Min çi kir nebû, dawî min dev ji taeta xwe berda. Hûn jî dibêjin, " Kalo xurûfiye. Welle ez ne xurûfî me. Min tiştek ji dinyayê fêm nekiriye."

# Meleyê xurt

Rojekê yek bû meleyê gundekî. Muxtarê gund ji Mele pirsî : "Mele tu xurt î?"

Mele bi pozbilindî bersiv da û got: "Erê ez xurt im."

Muxtar çav kire yekî û got: "Hûto rabê, ka bê Mele çiqasî xurt e."

Hûto weke dêwekî filitî meleyê reben û ew da ber kulmên xwe û pihînên xwe.

Bû qareqara meleyê di nav destê Hûto de. Mele hey bang dikir: "Heyran we şaş fêm kiriye... Lawo! Min xelas bikin."

Piştî mele têra xwe kulm û pihîn xwarin, Hûto dev jê geriya. Muxtar ji mele pirs kir: "Meleyê efendî ka xurtiya te.."

"Melê reben çavşikestî li Hûto dinêrî, bersiva muxtar bi zorê wiha da: "Heyran we şaş fêm kiriye, ez bi ilmê xwe xurt im, ne bi qeweta xwe."



# Cerdevan û nasname

Em çend heval ji serxweşiyê vedigeriyan. Roj li ber ava bû. Ji Batmanê heta em gihîştine Midyadê, pênc caran terempêla me ji aliyê tîm û leşkeran ve hate sekinandin. Lêgerîna ser mirovan û pirsariya nasname hate kirin.

Dema em ketine nava Midyadê li rawestgeha serê bajêr tîm, leşker û cerdevanan dîsa terempêla me sekinanidin. Lê tîm û leşker nêzîkî me nebûn. Tenê çar cerdevanê bi rextên şidandî û keleş di destan de ber bi me hatin. Em hemû peya kirin.

Cerdevanê diranzêr û simbêlpêj (xuya bû ku sercerdevan e) xwe piz kir û bi dengekî bilind got:

– "Hepisînî siraya geç! (Hemû bibine rêz)

Mirovên terempêlê ji bilî du kesan, hemû mamoste û sisê bijîjk (doktor) bûn. Me di nav xwe de ji hev û dû re got: "Riya xeberdan û peyvên sar em bi wan nedin. Emê bibine rêz"

Em hêdî hêdî bûne rêz.

Sercerdevan li hevalên xwe vegeriya û got:

– Erebesînî arayın! (Li terempêlê bigerin!)

Berê xwe da me û got:

– Kimligisini cixarin bayım! (Nasnamê xwe derînin) Her sê cerdevanê din ketine hûndirê terempêlê, weke xiltê kor ku bi keve axê û bike lod, binê terempêlê anîne ser. Me nasname derxistin û hevalê serî nasname da dest. Nasname ya mamostetiyê bû. Sercerdevan kir û nekir tiştek jê dernexist.

Bi dengekî bilind got:

– Senin kimligî neden böyledir? Senin adisî nedir? (çima nasnameya te wihaye? Navê te çi ye?

Mamoste beşişî û nasnameya ku sercerdevan ters girtibû, di destê wî de rast kir û jê re got:

– Ma qey tu nizanî rast bigirî? Va ye navê min dinivîse! Sercerdevan sor bû, spî bû û madê wî giriji. Dîsa xwe piz kir, lê bi dengekî nizim got:

– Hedî hepisinî gidin! (Haydê hemû herin).

***Jir Dilovan***

**Jûjî...** **Doğan Güzel**



*Hildana muafiyeta mebûsên DEP'ê bû sebep ku, zehfê dewletên Ewrûpî li dijî dewleta Tirk tewir bistînin*

# Qûş li Tirkiyeyê teng dibe

**Navenda Nûçeyan–** Tirkiye, ji ber qerarê hildana muafiyeta parlementerên DEP'ê dikeve tengasiyê. Çeperên hiqûqî, siyasî û dîplomatîk lê teng dibin. Amerîka jî tê de gelek dewlet tevî Almanya, Fransa, Îngilîstan nerazîbûna xwe bi riyên ji hev cihê didin nîşan. Kurdan tevî rêxistinên demokratîk li derveyî Tirkiyeyê bertekiyên (reaksiyanên) xwe bi meş, xwepêşandan dan der. Dewletên Ewrûpayî li ser rewşa DEP'vanan dest bi çalakiyan kirin.

Bûyera mebûsên DEP'ê kir ku serê Tirkyeyê biêşe. Sazî, dezgeh û rêxistinên demokratîk ên navneteweyî tevî dewletên Rojavahî ve mijara hildan muafiyeta 6 parlementerên Partiya Demokrasiyê û yekî serbixwe xistin rojeva xwe. Derbeya 2'ê Adarê tesîrekê nêyînî li Tirkiyeyê kir ku Volkan Vural Sermuşawirê Tansu Çiller di 5'ê Adarê de li ser bûyerê birîfingek da konsolosên biyanî yên li Enqerê. Bi gotineke din Tirkiye li ser bûyerê îfade da biyaniyan.

### ÇALAKIYÊN DEP'VANAN

Partiya Demokrasiyê (DEP) bi parlementerê Amedê Sedat Yurtdaş û Serokê Belediyeya Amedê yê berê Mehdî Zana ve li Ewrûpayê dest bi çalakiyên dîplomatîk kirin. Mehdî Zana bi Serokê Weqfa Azadiyan a Fransayê Danîelle Mîtterrand re hevdîtinek pêk anî. Mîtterrand jî bi Zana re serî li Serokê Komîsyona Yekîtiya Ewrûpayê Jacques Delors û Wezîrê Karê Derveyî yê Belçîkayê Willy Claes da û ji wan xwest ku li hemberî qewmînên li Tirkiyeyê bêdeng û tevger nemînin. Mîtterrand di 10. 3. 1994'an de jî li Bonnê jî hevdîtin bi Serokwezîrê Alman Helmut Kohl û Wezîrê Karê Derveyî Klaus Kînkel re pêk anîn

Sedat Yurtdaş jî li Parlementoya Ewrûpayê di 9.3.1994'an de civînekê ji bo çapemeniyê li dar xist û qewimînên li Tirkiyeyê, gelşa Kurdî û rewşa hilbijartinê anîn zimên.

### MÎTTERRAND JÎ BÊTEVGER NEMA

Ji aliyê din ve Serokkomarê Fransayê François Mîtterrand jî bêtevger nema. Hate hînbûn ku Mîtterrand bi riya telefonê ji Serokê Civata Parlementerên Ewrûpayê Mîguel Angel Martînez xwestiye ku li dijî biryara hildana muafiyeta parlementerên DEP'ê helwest bide nîşan û li kirina li dijî parlementerên DEP'ê temaşevan nemîne.

Mîguel Angel Martînez jî belavokekê weşand û daxuyand ku ji qewmînên li Tirkiyeyê bi xem in û kirinên ku dibin ne li gorî normên demokrasiyê ne. Martînez bi vê yekê jî nema û derbir ku wê mijarê bibe Konseya Ewrûpayê ji bo bê muneqeşekirin. Civîna konseyê wê di nav rojê 11–15'ê Avrêlê (Nîsanê) de çêbibe.

### YEWNANÎSTANÊ TIRKIYE GILÎ KIR

Serokê Parlementoya Yewnanîstanê Apostolos Kaklamanîs der barê rakirina muafiyeta mebûsên DEP'ê de, ji Serokê Parlementoya Ewrûpayê û serokên parlementoyên welatên ku endamên Yekîtiya Ewrûpayê ne gilînameyek şandin. Di gilînameya xwe de dide diyarkirin ku şêla Tirkiyeyê ya hildana muafiyeta parlementeran ne demokratîk e û protestokirina Tirkiyeyê jî wan xwest.

Parlementoya Ewrûpayê jî di civîna xwe ya 10'ê vê mehê de qerarê protestokirina Tirkiyeyê ji ber hildana muafiyeta mebûsan stand. Parlemento, ji hikûmeta Tirk berdana mebûsan û dayina heqê otonomiyê ji bo Kurdan xwest. Biryar di gel 3 rayên li dijî, bi 212 rayan hate qebûlkirin.

Marc Galle, Serokê Komîsyona Parlementoya Tevlîhevî ya Tirkiye–Yekîtiya Ewrûpayê, li ser navê Serokê Parlementoya Ewrûpayê, ji bo vekolîna qerarê hildana muafiyeta parlementerê DEP'ê, serdanek li Tirkiyeyê kir. Bi Tansû Çîller, Serdozgerê DED'a Enqerê Nusret Demiral û Cigirê Serokê Giştî yê DEP'ê Remzî Kartal û parlementer Mahmût Kilinç re hevdîtin pêk anîn. Galle di daxuyaniya xwe ya bi Özgür Gündemê re gote ku hewce ye meseleya Kurdan bi riyên siyasî bê çareserkirin û mesele navneteweyî ye. Marc Galle wiha got: " Kurdên ku li Stenbolê dijîn hene, Kurdên ku li bakurê Iraqê dijîn hene, Kurdên ku li Almanyayê dijîn hene. Di rastiya xwe de ev mesele navneteweyî ye."

### LI DERVE LIVBAZIYÊN KURDAN

Kurdên ku li derve û li Ewrûpayê dijîn meş, xwepêşandan û protestoyên cihêreng li dijî Tirkiyeyê pêk anîn. Bertek û helwestên xwe bi rêxistinên demokratîk re dan der û li ber deriyên konsolosxaneyên Tirkiyeyê livbaziyên protestoyî li dar xistin. Livbaziyên bi vî celebî bêhtir li bajarên Almanyayê qewimîn.

Komele û rêxistinên Kurdan tevî partî û saziyên Fransiz daxuyaniyeke hevpar (muşterek) dane kirin û ji hiqûmeta Fransiz xwestin ku bi awayekî lezgînî dest biavêjin bûyerê û bi rayedarên hikûmeta Tirk re bikevin têkiliyê, ji bo îadekirina muafiyeta parlementeran û berdana wan.

Ji aliyê din ve ev sazî û komele di roja 10'ê Adarê de li ber Wezîriya Karê Derveyî meşekê li dar xistin û bi Berpirsiyarê Karên Ewrûpayê yê Wezîrê Karê Derveyî M. Boudard re hevdîtin pêk anîn. Di nav sazî, rêxistin, partî û komeleyên ku ketine meşê hin ji wan ev bûn: Weqfa Azadiyan a Fransayê, Federasyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê, Li Hemberî Nîjadperestiyê Biratiya Gelan (MRAP), Partiya Sosyalîst, Partiya Komunîst, Keskevan, Ligâ Komunîstîn Şoreşger, Komeleya Fransiz û Kurdan, Hevra– Kom û Komakar.

### LI ÎNGILÎSTANÊ HEWLÊN PARTIYAN

Partiyên Îngilîz, li ser girtina mebûs û rakirina muafiyeta wan û binpêkirina mafên mirovan bi pêşniyarnameyekê mijar anîn rojêva Kamereya Avamê.

Parlementerên ji Partiya Karker, Partiya Lîberal, Partiya Muhafezekar û Partiya Neteweyî ya Gallerê, di pêşniyarnameya xwe de derbirin ku pêwistî bi çareserkirina meseleya Kurdî heye û ew yek jî divê di çarçoveya Qanûnê Bingehîn de were pê. Ji bo ku pêşniyarname bikeve rojeva Kamereya Avamê û li serê bê axaftin, pêdivî bi 150 îmzeya parlementeran heye. Ev pêşniyarname ji îmzekirinê re hate vekirin.

Wekî din rayedarên hikûmetên Îspanya, Holanda, Swîsre, Belçîka, Yewnanîstan û hwd. jî bi riyên cihêreng bertekî û helwestên xwe yên li hemberî kirina Tirkiyeyê ya der barê girtina mebûsên DEP'ê û hildana muafiyeta wan de, dan der.

### JI AMERÎKAYÊ XWESTINA ÇAREYA SIYASÎ

Cîgirê Wezîrê Karê Derveyî û Berpirsiyarê Karên Derveyî yên Kanada û Ewrûpayê yê Amerîkayê Stephan Oxman daxuyand ku Reveberiya Amerîkayê û Kongreya DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê)'yê ji qewmînên dawî ne razî ne. Oxman di daxuyaniyên xwe de îfade kir ku hewce ye Tirkiye ji bo çareserkirina meseleya Kurdî gavên aborî û siyasî jî biavêje. Stephan Oxman got ku di meseleya terorîzmê de piştgiriya Tirkiyeyê dikin, lê hewce ye ku ji meseleya Kurdî re bi muhafezekirina xaka Tirkiyeyê çareya siyasî bê dîtin. Oxman berê jî li ser helkirina pisgirêka Kurdî bi vî awayî peyivîbû.

Ji hêla din ve Kurdên ku li Amerîkayê dijîn jî dest bi xebateke lobiyî kirin. Li gorî nûçeya ku di rojnameya Hürriyetê de derket, Kurdên alîgirên PDK û YNK'ê jî tevî yên PKK'ê ve di Kongrey Amerîkayê de dest bi çalakiyan kirine. Lobiyên Ermenî û Yewnanî jî destek didine wan.

Amerîka tevî dewletên Ewrûpayê ve bi awayekî wisa li hemberî qerarê meclîsa Tirk derketin ku, Tirkiye di warê dîplomasiyê de kete tengiyê. Sedemê bertekî û helwestên Rojavahiyan bi xurtbûna pêşengiya tevgera azadî ve tê girêdan. Kurd ne bi tenê li Kurdistanê her wiha li navendên Ewrûpayê jî bi şêweyeke girseyî meş, xwepêşandan û protestoyan li dar dixin. Potensiyela Kurdên ku li Ewrûpayê dijîn jî tirsê dixe dilê rayedarên dewletên Rojavahî. Lewre dibînin ku ew girseya radîkal ji PKK'ê ne veqetandî ye û her pêgirên wê ne.



*Danielle Mitterrand*



*Helmut Kohl*



*Marc Galle*



*Tansu Çiller*

## Konferansa Komîsyona Newrozê

**Hannover, Welat–** Roja 8.3.1994'an komîsyona ku ji Hannover diçe Kurdistanê konferansekî çapemeniyê li dar xist. Hejmara vê komîsyonê, di nav de 2 rojnamevan, 1 radyovan (nûçevanê radyo), 1 sendîkevan 16 kes in. Saziyên ku wê destek dikin, Medico International, IGM–Hannover, Partiya PDS, Dêr (Kilîse) û Radyoya Florans û Kurdistan Information (KİB).


Di vê konferansa ku pirr rojnameyên mezin û radyo mîna Hannoverche Allgemeine, Neue Presse, Radyoya NDR û hwd. bi firehî li ser girtina parlementerên Kurr rawestin çêbû.

Peyvdarê komîsyonê da xuyakirin ku tu têkilî di navbera vê komîsyonê û PKK'ê de nîn in. Li ser perçiqandina gelê Kurd bi dirêjahî rawestiya. Rola dewleta Alman di şerê qirkirina gelê Kurd de ku ji hêla dewleta Tirk ve bi rê ve diçe pişange û protesto kişandina çekên Almanî mîna şermeke mirovahî û demokratiyê dît. Nerazîbûna komîsyonê li ser qedexekirina PKK û saziyên Kurd yên demokratîk li Almanya xwe belî kir. Ev komîsyon, mîna gelek komîsyonên din ku diçin Kurdistanê dixwaze di dema Newroz û hilbijartinê de amade bibe û bi awayekî berbiçav bûyer û hoyên welat û kirinên komara Tirkî binirxîne û li ser van kirinan dewlet û raya giştî ya Almanî agahdar bike.

**Cejna we ya Remezanê pîroz be.**

*Rojnameya Welat*

# Gerdûna zarokên Kurd a doh û îro




## Ji NÇM'ê du berhem

Navenda Çandê ya Mezopotamyayê, du berhemên bi qalîte pêşkêşî muzîkhezan kirin. Kasetek ji stranên hunermendên Hunerkom û Koma Berxwedanê hatiye pê. Bi navê "Koma Berxwedan Helbestên Bijartî" ye.

Parçeyên ku di vê kasetê de cih distînin ev in:

| | |
|---|---|
| Beşa A | |
| Ez Şehîd im | (Comert) |
| Tu Nemerda | (Besê) |
| Em Kurd in | (Dilovan) |
| Herne Pêş | (Koma Berxwedan) |
| Beşa B | |
| Hoy Mamo | (H. Sefqan) |
| Ger Ferman Be | (Dilgeş) |
| Hey Gulê | (Seyîtxan) |
| Şoreşgerê Kurdistanê | (Koma Berxwedan) |
| Aman | (X. Xemgîn) |
| Birano | (X. Xemgîn) |

Kaseta duyemîn jî bi navê "Hekîmo" ye. Ev berhem cara pêşîn ji aliyê weşanên Hunerkomê ve hatiye derxistin. Navenda Çandê ya Mezopotamyayê jî, bi eynî navî ji nû ve weşand.

Stran û klamên berhemê gişt gelêrî ne û ji aliyê hunermendên emekdar Zadîna Şakir û Hemîdê Mecîd ve hatine strandin. Herdu dengbêj jî, ji Kurdên Ermenîstanê ne û kesê ku li Radiyoya Erîwanê Beşa Kurdî guhdarî kiribe, wê dengê wan jê re xerîb neyên. Bi awayekî nûjen bingeh ji stran û klaman re hatiye çêkirin û bi piredengî hatine strîn. Di herdu aliyên kasetê de ev parçe hatine gotin:

Beşa A:
Keleşo
De wî Omer Axa
Çolangî bi dar e
Gede lawikê min
Were bê Hekîmo
Malka Şemo
Beşa B:
Rizgan û Nûrê
Nînara te me
Gozê gozelê
Derwêşê Evdî
Narîn can
Her lêlê kinê






*Şerê serxwebûn û azadiyê bandora xwe li zarokên Kurdistanê jî kir, çawa ku zarok di întifadaya Filîstiniyan de wek generalên biçûk dihatin binavkirin, li Kurdistanê jî zarok bûn xemla serhildanan.*

**Seyfettîn Özcan**

Piştî derketina PKK'ê û bi taybetî jî, di pey raperîna 15'ê Gelawêjê (Tebaxê) de, li Kurdistanê her tişt dest bi guherînê kir. Weke her tiştî gerdûna zarokên Kurdan jî ji vê yekê dûr nema. Her çiqas şerê çekdarî li bakurê Kurdistanê dest pê kiribû jî, lê bandora xwe da her çar hêlên welêt. Bêguman ev guherîn bi awayekî hêsan pêk nehat. Heta hinek tişt bi çetînahî çêbûn. Bi vê yekê re gerdûneke nû ji zarokên Kurdan re çêbû û her wiha jiyaneke nû jî dest pê kir. Berî her tiştî, zarokên Kurd nasnameya xwe ya neteweyî nas kirin. Bi rastî û nirxên xwe yên neteweyî û civakî hesiyan. Ziman, dîrok û çanda xwe nas kirin. Özgür, Devrîm, Umut, Emekçî, Sevda, Çîçek, Yaşar, Çîğdem, Îsfehan, Faris, Seydî, Hayat, Tikrît û Ereb, bûne Azad, Şoreş, Hêvî, Kedkar, Evîn, Kulîlk, Jiyan, Kurmanc, Jale, Sosin, Mehabad, Goran, Behzad, Soran, Berzan û hwd.

Êdî ne li gorî daxwazên Tirk, Ereb û Farisan li gorî daxwazên xwe yên neteweyî mezin dibin. Êdî talankirina nirxên xwe yên neteweyî seyr nakin. Di wan waran de karên dijmin hêsan nakin.

Ev pêşketin ji bo zarokên Kurdan gelek mezin û girînge. Lê ji bo zarokan ne bes e. Berî her tiştî mafên wan î herî mezin perwerdehiya bi zimanê wan e. Mezinbûna wan divê bi awayekî têr, bêtirs û azad be. Park, bexçe ji bo lîstikê hebe û di nexweşxaneyan de tedawiya wan hêsan be.

Zarokên Kurdistanê îro di cihê biçine dibistanê, di bexçe û parkan de bileyizin û kêf û zewqa zarokatiyê derxin, ji bo ku zikê xwe têr bikin, ji bo nanekî an şivan e, an golikvan e, an jî boyaxvaniyê dike. An jî, sênî li ser serê wî ye, li kuçeyên bajaran tiştan difroşe. Belkî jî, bi tirsa mirinê re rojname belav dike.

### MAMOSTEYÊN ZAROKAN MEZINÊN WAN IN

Mîna ku me got, zarok her tiştî ji mezinê xwe hîn dibin. Lê çi mixabin demeke dirêj gelek mezinên zarokên Kurdan radestiyê (teslîmiyetê) hînî wan kirin. Lê îro zarokên Kurdan bi gotinên wan mezinên ku, radestiyê fêrî wan dikirin, nakin. Ev jî serkeftineke mezin e. Lê zêde gotinên me ji mezinên zarokan re nîn e. Em dikarin bibêjin di hinek hêlan de kêmasiyên ronakbîr û welatparizên me hene. Bi taybetî jî, ji aliyê zimên ve. Bi giştî yên ku li metropolan dijîn, zarokên wan bi Kurdî nizanin.

Bêşik ev mesele di demeke kin de hel nabe, ji ber ku, bi sedan salan xelkê me bindest maye. Ji aliyê din ve jî, xebateke zanyarî ya fireh, ji dil li ser zimên çênebûye. Gereke em jî, li gorî vê cîhana nû şeklek bidine xwe û zarokên xwe. Li ku dibe, bila bibe ji bo hînkirina zimanê Kurdî ji bo zarokan divê em têbikoşin. Mercekî welatparêziyê jî ev e. A diduyan jî, divê navê zarokên xwe li gorî zimanê wan li wan deynin.

Gava em dixwazin hinek tiştan pêk bînin gereke em baş bala xwe bidinê. Lewre zimanê Kurdî demeke dirêj e, ji hev belav û ji xebatan dûr maye. Ziman di demeke kin de tekûz nabe. Jixwe ev xebat li ser milê rewşenbîrên Kurdan e, le hînbûn û hînkirina zimên wezîfeya her kesî ye.

*Bêşik ev mesele di demeke kin de hel nabe, ji ber ku, bi sedan salan xelkê me bindest maye. Ji aliyê din ve jî, xebateke zanyarî ya fireh, ji dil li ser zimên çênebûye. Gereke em jî, li gorî vê cîhana nû şeklek bidine xwe û zarokên xwe. Li ku dibe bila bibe ji bo hînkirina zimanê Kurdî ji bo zaro kan divê em têbikoşin. Mercekî welatparêziyê jî ev e. A diduyan jî, divê navê zarokên xwe li gorî zimanê wan li wan deynin.*

*Roje reşekey 16.3.1988 î Helebce*

# Birînêkî le yad neçûwe



**Sîrwan Reşîd**

Salî 1979 ke Seddam Hûseyînî serşêt û serero bû be"Hakimî mutleqî" Iraq, heman sal le konfransêkî rojnamenûsî da be berçawî rojnamenûsanî biyanî û be berçawî seranserî dinyawe witî: "Her kesêk bixwazê rijêmekey ême le Iraq da labidat, xakêkî bêmirov werdegrê ke seranserî xolemêş e. Kurd delê gûtin nîwey kirdine, Seddam ew qiseyey kird û kes lomeşî nekird. Be rastî Seddam le rojî 16.3.1988 da ew meram û mebeste gilawey xoy be kirdewe hênaye cê û selmandî ke her kesêk le astî da daway mafe demokrasî û miroyekanî xoy bikat, betenya ew dawaye bese bo ewey xakekey bikate xolemêş. Min lem kurte nûsîne da naxwazim basî çonyetî kîmya baran û ew hemû qurbaniye bikem ke le tiracîdiyay Helebce da derbaz bûn, be qeder ewey dexwazim basî ew karesate tirsinake bikem wekû gewre xalêkî werçerxandin.

Xalêkî mezinî le ser westandin û têraman û têfikrîn le têkoşînî gelî Kurd da. Be rastî debû Helebce bikrête dersî siyasî û serbazî mezin û lêkolînewey gewre gewrey der heq amade bikrê, belam wa diyar e ême hêştaş agaman le mezine birînekanî mêjûman niye. Helebce ew rûdawe ye ke dekrê pêşrewanî Kurd le her parçeyekî Kurdistan da, le serî biwestin û biken be dersî girîngî mêjûyî. Helebce manay deste û ejno westandinî mirov e beramber be çekî taze û hawçerx, yanî bê çareyî "Şorişgêre" der heq be çekêk ke le qudiretî ew da niye le hemberî rawestê, çekêk ke be hemû core yasakan bekar hênanî qedexe ye, keçî şarêkî Kurdan be ber çawî seranserî dinyawe debête taqîge bo ew çeke jehrawiye. Rûdanî karesatî cerig birî Helebce dekra bibwaye be dersî gewrey sitratîjî bo siyasetmedaranî gelekeman û dersêkî mêjûyî wa tal debû ber encamî başî hebwaye ke ew ziyane gewreyey lebîrî gelekeman bibirdayetewe, belam nek ewane nebûn û bes belkû ew karesate mal wêrankere nebû be mayey "yekgirtnêkî rasteqîney" Kurdanîş.

Gelo: "Le diwa diwayî sedey bîstem da kê berpirsiyar e beramber bem karesate, kê tawanbarkira û kê dadigayî kira, çi karxaneyekî em core çeke gûnahbar kira. Kê û kê û kêytir.

Be rastî hemû dinya be taybetîş zil hêzekanî dinya û le naw ewanîş da Emperyalîzim tawanbar in û tawanekeyan le Seddam Hûseyîn kemtir niye. Be rastî seyr e û mayey xecaletiye bo hemû ewaney temaşa deken "gewre û biçûk" ke gelêkî bê bergirî le hêrişêkî awha naberamber da qetlûam dekrêt û kesêk niye be hanayene biçê, kesêk niye sinûrêk bo ew kabra serşêt û sero ye, bo ew hakim mutleqey Iraq danê.

Le hemûşî ziyatir mayey xecaletî û pir şermezarî ewe bû piştî çend mangêk diway karesatî Helebce her le nizîkî Helebce wi piyawanî Seddam Hûseyîn awedaniyekiyan dirûst kird ke ordugayekî zoremilê bû û nawyan na Helebcey Seddamî "..A eme ye kare dirindeyekanî faşîstan ke diway qetilûamîş şerî derûnî be xelk ra berpa deken.

Helebce bo Kurd birînêkî besiwê ye û bîrçûnewey niye, belam bo dûjminanîşman mayey şerm û ser şorî heta hetayiye.

*Be rastî hemû dinya be taybetîş zil hêzekanî dinya û le naw ewanîş da împiryalîzim tawanbar in û tawanekeyan le Seddam Hûseyîn kemtir niye. Be rastî seyr e û mayey xecaletiye bo hemû ewaney temaşa deken "gewre û biçûk" ke gelêkî bê bergirî le hêrişêkî awha naberamber da qetlûam dekrêt û kesêk niye be hanayene biçê, kesêk niye sinûrêk bo ew kabra serşêt û sero ye, bo ew hakim mutleqey Iraq danê.*

## HELEBCE

***Çwardey mang bû***  
***Le ser Goyje***  
***Ba qelemekey lê senim***  
***Wextê daymewe binûs im***  
***Pol pol firîn wişekan im***

***Panizey mang bû***  
***Katê Sîrwan qelemekey***  
***Lê wergirtim***  
***Katê daymewe binûs im***  
***Bûn be masî şiîrekan im.***

***Şanzey mang bû***  
***Ax şanzey mang***  
***Ke Şarezûr qelemekey***  
***Lê wergirt im***  
***Katê daymewe binûs im***  
***Wek Helebce.***  
***Wşik bûbûn pencekan im.***

***Şêrko Bêkes***

*Di sedsala 16'an de fîlozofekî dema modern Francîs Bacon:*

# Polîtîka bêyî zanistê nameşe

**Şerefxan Cizîrî**

Di dîroka ilm de pirr nav hene ku bûne sembol ji bo hinek tiştan. Wek mînak mirov dikare bibêje: **Galîleu** bûye sembola azadiyê. Ilmzanayê Îngilîz **Francîs Bacon** (1561-1626) jî li miqabil spekulasyon û îdealîzma felsefî bûye sembola ilmên praktîk. Organîzekirina xebat û damezirandina akademiyên ilmî jî, dîsa bi xebata Bacon ve ji nêzîkahî ve girêdahî ye. Bacon ji pirr aliyan ve di warê ilm û felsefeyê de pêşengî ji dema xwe re dikir. Wî di van xebatên xwe de zehf behsa berjewendiyên civakî dikir. Li gor wî diviyabû ilm û teknolojî di xizmeta mirovahiyê de bûna û ji bo berjewendiyên civakê bihatana bikaranîn. Ev yek daxwaz û nêrîneke pirr bedew bû, lê mixabin kapîtalîzmê îro ilm û teknolojî xistine bin xizmeta sermayedaran. Ilm û teknolojî îro di pirr aliyan de alîkariya mirovkujiyê dikin. Heger niha Francîs Bacon sax bûya, wê çi bigota?

### BACON Û XEBATA ZANISTÎ

Ji destpêka 1580'yan û bi vir ve Bacon dest bi xebata ilmî kir. Pirtûka wî ya yekemîn ku tecrûbe û dîtinên wî bi awayekî giştî dianîn zimên pirtûka **Essays** bû. Bacon di vê berhema xwe de gelek tişt li ser jiyanê, zanabûn, xwezayê û nûjentiyê nivîsandine. Li gorî wî ji bo mirovên modern zanîna ilmê û xwezayê girîng bû. Mirovê modern mirovê zana bû. Zanabûn jî diviyabû ji bo berjewendiyên civakê bihata bikaranîn. Di warê felsefe û zanistê de Bacon metodên ampîrîk bi pêş dixistin. Di metodên xwe yên zanistî de wî bi awayekî pirr dijwar li hemberî felsefeya **Aristoteles** û ilmê skolastîk derdiket û îdîa dikir ku ev felsefeyeke bêfeyde ye, pirs û bersivên ku felsefeya skolastîk pê dadikeve zengar girtiye. Li hemberî vê felsefeyê wî felsefeya Petrus Ramus diparast. **Petrus Ramus** zanyarekî Fransiz bû û di warê felsefeyê de, berî hemû tiştî giranbihabûna praktîkê derdixist pêş.

Di sedsala 15 û 16'an de şoreşa ilmî li dar ket. Bi şoreşa ilmî re dîtinên mirovan yên li ser civak, xweza, gerdûn û olê ji bingî ve guherîn. Ev dema nû ku bi awayekî giştî dibû destpêka kapîtalîzmê, di sê tiştên nû de xwe dida xuyakirin: Hunera çapkirina pirtûkan, barût û pisûle. Van her sê keşfên nû tesîreke pirr mezin li wêje, huner û awayê şer û li navigasyonê (çûnûhatina di behrê de) dikir. Di encama bikaranîna van her sê tiştan de li cîhanê gelek tişt hatin guherandin. Dîwarê li pêşiya pêşveçûna civakê û ilmê yek bi yek dihatin hilweşandin. Bi pêşketina kapîtalîzmê re danûstandinên civakî, çandî, siyasî û îdeolojîk jî dihatin guherîn. Akademî û saziyên zanistî dihatin avakirin. Li Ewrûpayê akademiya pêşî li Îngilîstanê ava bû. Di salên 1600'an de bi navê **"Royal Society"** akademiyeke ilmî damezirî û li gora program, felsefe û dîtinên Francis Bacon xebatên wê dihatin meşandin.


### LI GOR BACON ZANIST Û POLÎTÎKA

Bacon hem zanyar, hem jî polîtîkvan bû. Wî ilm û polîtîka bi hev re dimeşandin. Gelek caran mirov dikare bibihîse ku ilm û polîtîka mijarên ji hevûdin cuda û dûr in. Bi taybetî çînên serdest û entelektuelên nîvçe, dixwazin dîwarekî qalind di navbera ilm û polîtîkayê de ava bikin. Li gorî dîtina wan ilm objektîf û bêalî ye, polîtîka jî subjektîf û alîgir e. Ev dîtin ne tenê ji bo ilm û polîtîkayê, lê ji bo warên din jî tê pêşkêşkirin. Li gorî wan her war bi serbixwe ye û pêwendiya yekî bi yên din re tune. Bes, em hemû baş dizanin ku di rastiya xwe de ilm, siyaset, huner, wêje, ekonomî û hwd. giş bi hevûdin re di nav danûstandineke pirr xurt û diyalektîkî de ne. Ma polîtîkaya ku dîtinên ilmî tê de tunebe çi polîtîka ye? Hunereke ku dîtinên ilmî tê de tune bin, gelo ew çi huner e. Ilm divê di vê hevgirêdanê de bi awayekî fireh bê fêmkirin.

### NEW ATLANTÎS'A BACON

Pirtûka Francîs Bacon ya dawî bi navê **New Atlantis** (Atlantîsa Nû) e. Ev pirtûk di warê ilm de bûye klasîkek. Atlantîs li cem fîlozofê mezin **Platon** giraveke xeyalî bû. Bacon û hevalekî xwe di behra mezin de rastî giraveke nû dihatin. Navê vê giravê **Bensalem** bû. Di pirr waran de organîzekirina civata Girava Bensalem îdeal bû. Di vê civatê de heq û hiqûq hebû. Li nav wê civakê qîymeta ilm û zanyarîyê hebû. Ji gelek aliyan ve civaka Bensalem ji yên derdora xwe pêşketîtir û medenîtir bû. Sazgeha herî girîng di vê civakê de Mala Salomon bû. Weke tê zanîn Salomon di mishefa filehan de -di Incîlê de- sembola zanyariyê ye. Di dezgeha Mala Salomon de pirr mekîne, halet û tişt hebûn ku bala mirovên mêvan dikişandin. Mala Salomon laboratuareke modern bû. Bacon û hevalên wî li hemberî pêşketina teknolojî û zanistiya li Girava Bensalem şaş diman. Bacon li vê derê bi awayekî îdealîzekirî mizgîna civata pêşerojê dida. Ev pirtûk di sedsala 16'an de hatiye nivîsandin. Pirr tişt û mekîneyên ku Bacon bi awayekî îdealîzekirî behs dikir, îro di civata kapîtalîst de bûne hacetên rojane. Di rastiya xwe de evqas tişt û hacetên ku Bacon û hevalên wî şaş dikirin, li ser zanabûna Bacon bi xwe ava dibûn. Mirov dikare bibêje ku Bacon ji aliyê ilm û teknolojiyê bi çend sedsalan li pêşiya civata xwe bû.

Li gorî dîtina Bacon wê hemû keşfên nû alîkariya mirohiyê bikirana ku xwezayê fêm bikin û bandora xwe lê bikin. Di dîroka zanistî de demeke nû dest pê dikir.


Bacon hem zanyar, hem jî polîtîkvan bû. Wî ilm û polîtîka bi hev re dimeşandin. Gelek caran mirov dikare bibihîse ku ilm û polîtîka mijarên ji hevûdin cuda û dûr in. Bi taybetî çînên serdest û entelektuelên nîvçe, dixwazin dîwarekî qalind di navbera ilm û polîtîkayê de ava bikin. Li gor dîtina wan ilm objektîf û bêalî ye, polîtîka jî subjektîf û alîgir e. Ev dîtin ne tenê ji bo ilm û polîtîkayê, lê ji bo warên din jî tê pêşkêşkirin.

Zanebûn diviyabû di xizmeta mirovahiyê de bûya. Zanist dikaribû bihata têgihîştin, bikaranîn, komkirin, belavkirin û sazkirin. Ne bi tenê Xwedê tişt dizanibûn, mirovan jî dikaribûn bibin xwediyê zanetiyê. Ji ber vê yekê Bacon digot: "Zanîn desthilatdarî ye". Ma polîtîka bêyî zanebûnê dibe? Di dema me ya modern de polîtîkayeke ku rihê xwe ji zanebûnê negire, wê çiqasî karibe bi ser keve?

Bacon polîtîkvan û zanyar bû, xebatên polîtîkî û zanistî bi hev re dimeşandin. Ji ber vê yekê jî Bacon îro ji berê aktueltir e.

## Welato



Ezê te di bîra dilê xwe de xwedî bikim
wek defika dewrêşkan, tê her dem di
xezna çavên min û di bin konê awirên
min de bî welato...
Wek desmaleke diyarî, ezê te di
berîka xwe de bi rûmet veşêrim
Ezê te wek hina destê xortan
li rûpelên pirtûka xwe ya stranên
evîndariyê bidim ta mirinê
Tu yê di girtîgehê de, li ber darê
dardakirinê, her wekî li ber
balgîva min, di dema mirinê de,
wek xişxişka zarokekî, an jî wek
ken û nazên bedewekî bi hesteke nemir biborî...
Dibe ku ez te di firîna çivîkekê de
an jî di baciyeke dengbêjiyê de bibînim,
xem nîn e welato...
Hezar mirin, hezar îşkence dilên bi
kesera te tijî naxeniqîne. Çavên ku
liqayî xweşiyên te hatine kor nake welato...
Ezê navê te li ser rûçikên dêmbestan
"KANA AVÊ" binivîsim, tu yê di cîhanê de
bibî westgeha bazirganên hêviyê
Wek moriya nezerê, ezê te bi xwe re
bigerînim, biavêjime wistiyên
bejinzirav û qemerên welato...
Tê ji me re bibî gustîla dergistîtiyê
Di zîndanan de ezê te bikime
darê quwetê, ji bo şikandina
çol û qeydanên mil û zendê
Ezê te bikime gul, deynime
ber pencera girtîgeha xwe her wekî
tê ji min re bibî pêşeroj li hember
kotekiyên kela dilbager
Ezê te bikme birîna gulleya keleşkovê
wek hetwanên hekîmên kevnedil
Tu sebra min î, di tarîtiya
miringehê de wek kêşandina
cigareke bi tutûna qaçax pêçayî welato...
Ezê te romana jiyana belengazan de
bikime ro, ji giyana bindestan re bikime
kozek agirê tendûrê
Da ku tu bibî jankuj ji bo êşîna mirinê,
ezê kefa destên te tije ava evdilheyatê bikim
û zengilên te bi dengê
şervanan ve bixemilînim
Tu yê ji min re bibî avzêma jiyanê
Ezê laşên zarokên pîroz diyarî
te bikim welato...
"Axx welato
Ku ev kêser ya me be
Tu yê me
Emê jî te derxine firaqetiyê"

**M. Zahîr Kayan**

# Civaka Tirk mala xwe bi destê xwe xera dike

**J. Espar**

Civak di hin şertan de, fonksiyonên xwe yên civakî winda dikin. Di van şertan de, beriya her tiştî, civak ji aliyê normên exlaqî ve difelişe, jiyana siyasî, sosyal û çandî ji rê derdikeve. Zanistî, teknolojî, huner ji civakê re xizmet nakin. Her tişt ewqas ser û bin dibe ku, dînozor dikarin estetîkê û zebanî jî toleransê temsîl bikin. Civak nikare tiştekî nû biafirîne. Li hember problemên civakê tu kes xwe berpirsiyar nabîne, hîsên berpirsiyarî dimirin. Civak ji aliyê baweriyê ve dikeve nava krîzekê (aloziyekê). Nemá kes dikare behsa hin berpirsiyariyên kollektîf bike. Nayê bîra tu kesî ku, mafê xwe yê rexneyê bi kar bîne, rengê cihê namînin û peyvên pîroz wekî heq, hiqûq, azadî tiştekî îfade nakin. Ji devê sermiyanên civakê gotineke rast dernakeve. Durûtî û sextekarî dibin meziyetên mezin, bêhêvîtî û bêbawerî dibe karakterekî giştî li di civakê de. Civak dibe esîrê tirsê. Rastî mala xwe bar dike û diçe û civak ji vê yekê aciz nabe. Bi wî awayî her tiştê qenc û rind, rast û însanî, tiştên ku qedr û qîmeta însên berz dikin û civakê ber bi pêş ve dibin: her tiştê ku bi kêrî însên tên, wijdana civakê terk dikin. Bi kurtayî civak bi giştî ji hemû hîs, fikir û hijayiyên mirovahiyê dûr dikeve. Yên ku vê rewşê napejirînin jî, dibin hedefên êrîşên nedîtî. Ji vê gavê şûn ve, ev civak bi tenê dikare êş, zilm û nexweşî bide der û dora xwe.

Mixabin di civaka Tirkiyeyê ya îroyîn de, pirraniya van xisletên jorîn hene. Aliyê civakê ku riziyaye, îro ji her demê bêtir e û eşkere xuya dike.

Serokwezîra Tirkiyeyê Tansu Çiller, çavê xwe girtiye, devê xwe vekiriye, çi tê ber devê wê dibêje. Bi awayekî eşkere çavsoriyê dike. Wezîr, general, serokên partiyan û yên dadgehan, profesor û rojnamevan gotinên wê ducar dikin. Hedefên van tehdît û fortan bi giştî Kurd in, dezgeh û saziyên Kurdan in. Ji bo Serokê Partiya Dmokrasiyê Hatîp Dîcle re tê gotin: "Tu çawa dibêjî ku kuştina eskerên Tuzlayê encamekê şere? Şerê çi, ma li Tirkiyeyê şer heye? Ma mirov hewqas jî xayîn dibe!" û hwd. Gotinên wiha bi rojane, di dehan kanalên TV de, di sedan radyo û bêhejmar rojname û kovaran de tên gotin û nivîsadin. Ji bo ku mafê mebûsiya Hatîp Dîcle û hevalên wî rakin û wan bikin zîndanê, pêşniyar li ser pêşniyaran tên dayîn. Me dema ku ev nivîs dinivîsandin, Meclîsa Tirkan mafê mebûsiya 7 mebûsên DEP'ê ji wan standibû û Hatîp Dîcle û Orhan Doğan jî girtibûn.

Hin kes dernakevin û nabêjin: "Malxirabino, ma hûn hemû di carekê de dîn bûne? Niha di vî welatî de kêmtrîn deh hezar kes di şer de nehatine kuştin? Niha her roj balefirên me çiya, gund û bajarên Kurdistanê bombe nakin? Ma qey bi hezaran gundên Kurdan xerab nebûn û bi mîlyonan gundiyên Kurd ji ber vê yekê dev ji gundên xwe bernedan? Gelo pirraniya artêşa me li ku ye niha? Du hezar kesên Kurd ên sivîl di kuçe û kolanan de nehatine kuştin? Ji butçeyê 400 trîlyon ji bo şer nehatiye veqetandin? Me leşkerî dirêj nekir, em behsa seferberiyê nakin? Baş e, piştî ku tişt hemû rast in; ev şer nîn e çi ye gelo?"


Belê, ne ji sendîkayan, ne ji sazûmanên meslekî, ne ji unîversîteyan, ne ji dê û bavên leşkerên ku zarokên wan hatine kuştin û ne jî, ji meclîsê kes dernakeve û vê rastiyê nabêje. Civak tu reaksiyon li hember van gotinan nîşan nade. Tu dibêjî qey ev bûyer li Latîn Amerikayê dixqewimin û dem jî dema çaxa navîn e.

Baş e, ev dewlet çawa dikare wiha hereket bike? Ev civak bi çi awayî ketiye vî halî? Li ba me meseleyek heye, dibêjin: "Gur hatiye li sergoya gund cêlik aniye: "Zarokan bazdane çûne mal gotine: "Babo, gurê li ser sergoyê cêlik aniye." Bavê wan gotiye: "Werin hundir werin, ji teresiya kuçikê me ye" Ev mesele rewşa civaka Tirkiyeyê jî, dibêje "Belê wele tune ye." Lê ji vê "belê"yê civakê zirareke mezin dîtiye. Ji ber ku bi vê yekê balansa wijdana civakê xerab bûye. Êdî di destê civakê de pîvanek nemaye, ku ji tiştekê re bibêje "baş e" an jî "xerab e". Êdî civak nema dizane ji çi re heta ku tehemûl bike, heger 15–20 mîlyon Kurdên ku li ber çavan in tune bin, çima dema Atatürk demekê herî demokrat nebe? Heger wijdana civakê tunebûna Kurdan qebûl bike, çawa dikare li dijî cuntayên eskerî derkeve? Çawa dikare demokrasiyê biparêze?

Civakê carekê neheqiyeke mezin pejirandiye. Ji pejirandina tunebûna Kurdan mezintir neheqî tune ye. Civak nikare viya qebûl bike û li dijî neheqiyeke din derkeve. Ji ber wî jî, heger civaka Tirkiyeyê bixwaze ji bo xwe jî tiştekî baş bike, divê beriya her tiştî li dijî vê neheqiya mezin derkeve. Gava ku li dijî vê yekê be, dikare li dijî diziyê, îşkencan, bêkarî û feqîriyê derkeve. Dikare îrada xwe ji destê çend general û burokratan rizgar bike. Civak dikare li ser esasên heq, hiqûq û edeletê, xwe ji hemû aliyan ve ji nû ve organîze bike û bibe civakeke xwedî fonksiyonên normal.

Heger neke, ku heta niha nekiriye, wê rewş ji îro pirr pirr xerabtir bibe. Bi wî awayî civak dikare mala xwe bi destê xwe xerab bike, ku heta derekê kiriye jî. Talûke mezin e û mirov jê ditirse. Civaka Kurd jî dikare zirarên hin mezintir jî bibîne. Lê wê Kurd ji aliyê wijdanê ve rehet bibin û bibêjin. "Em bi heq bûn, tu riyekî din ji bo me tune bû."

Gelo wê civaka Tirkiyeyê çi bibêje?



## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**



**Çeperast:** 1–Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê 2–Xwedbînî, egoîzm/ Nezanî 3–Qayîlbûn, memnûnbûn/ Piştî dûayê tê gotin 4–Nîvgirava ku welatên Îspanya û Portekîzê li ser in/ Qewmekî bi eslê xwe ji bakurê Ewrûpayê 5–Pîr, ixtiyar 6–Ne tûj (ji bo aletên birrînê)/ Nexweşxaneya biçûk 7– Navekî mêran 8– Celebekî lîstikên şanogeriyê/ Yezdanê Rojê. 8–Kurtenavê ajanseke nûçeyan/ Banga ji bo limêjê 10–Kurtenivîsa Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê/ Bi awayekî din gotina alfabeyê

**Serejêr:** 1–Kesê ku zû fedî dike 2–Zehmetî, êş/ Dîndar 3–Şaxeke zanistê/ Li Cezaîrê bajarekî mezin 4–Hurmet, ewleyî 5–Di mîtolojiya Rojhilatê de Yezdanê Bereketê/ Cînavka yekemîn a pirehejmar 6–Zik/ Rengdêreke îşarkî/ Kişandina lêkera zayîna di dema bihurî de ji bo cînavka 3. a yekehejmar 7–Li gor baweriya olî kesên ku li ser rûyê dinê dijîn û nayêne dîtin/ Xweda, Yezdan (Bi Erebî) 8–An, yan/ Kurdên ku bi zaravayê Kurmancî dipeyivin 9–Gotineke ku şaşbûn û heyretê îfade dike 10–Em pê dipeyivin 11–Înstrumenteke muzîkê 12–Kesê ji Çînê.

**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Yaser Arafat 2–Etar/ Nûkirin 3–Kîsok/ Esrar 4–Oskar/ Îmar 5–Kadîn/ La 7–Alîkarî 8–Asîman 9–Ho/ In 10–Gîtar/ Çê

**Serejêr:** 1–Yekên 2–Atî/ Îlahî 3–Sason/ Îsot 4–Eros/ Skî 4–KKK/ Amir 6–An/ AA/ Ran 7–Rûerd/ În 8–Aks/ Îm/ Pê 9–Firîn 10–Aram 11–Tiral 12–Ra


## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
Tel (Fax) 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 120.000 | 50 DM |
| 6 meh | 240.000 | 100 DM |
| 12 meh | 480.000 | 200 DM |

# Diyarî mindalêkî başûrî Kurdistan

Mindalîne.. mindale çawgeşekanî bakurî Kurdistan selawtan lê bêt û çawekantan maç dekem, dexwazim basî kure Kurdêkî başûrî Kurdistan tan bo bikem ke du wêney be diyarî bo êwe rewane kirdwe... kewate ba dest pêbikeyn:

Kawe mindalêkî jîr û ruh sûke, le qutabxaney seretayî dexwênê le polî çware hemu salêk be yekem derdeçê, le wênekêşan da destêkî rengînî heye û berdewam hewlî eweş dedat ke xoy fêrî mosîqa lêdan bikat hestêkî netewayetî berzî heye, ew heste berdewam le wênekanîda reng dedenewe û debine hewênî serekî berhemekanî legel emaneşda kawe zor helbestî xoşî şayîranî Kurdî lebere û le ser şano û kor û kobunewey giştî û tayebtîda deyanxwênêtewe.

Dilniyam êsta kawe dilî le lay xuşik û birakaniyetî le bakurî Kurdistan û legel şehîdbûnî her Kurdêkdaka we û hawrêkanî dilyan dadexurpê û azarêkî tal deçêjin û dilyan le lay hemû ew mindalaneye ke gundekaniyan desutê û aware û perewaze debin.

Kawe em du wêneye û em helbestey mamosta "Letîf Helmet" Kehemuy lebere dekate diyarî bo xuşik û bira hêjakanî, mindale çawgeşekanî bakurî Kurdistan.

Minîş be xwatan despêrim û deste biçkolekantan deguşim û çawe geşekantan maç dekem, be hîwam le ayndeyekî nizîkda nîştîmane azîzekeman azad û serfiraz bêt:

**QELAY DIMDIM**

Qelayekî bilind im
Şanazî mêjuy Kurd im
Xanî lep zêrînî Kurd
Minî qelay dirust kird
Le şure û le qulem da
Kurd çu be gij Ecemda
Şa Ebasî tînwî xwên
Supay hêna be milwên
Xoy û supa têk şikan
Bun be pendî gişt cîhan
Şa Ebasî Fêlawî
Kêşay nexşey gilawî
Be saman û dirawî
Yekêkî xiste nawî
Ew yeke ke napak bû
Dwjminî gel û xak bû
Mehmud kêhekanî bû
Nefretî lêkirdmêj û
Le jêrewe zor û kem
Rêgey xoş kird bo Ecem
Kurd qiraniyan biryarda
Hezaranyan le dar da
Lew rojewe heta hem
Tif le şay Ecem dekem
Delêm dildaranî xak
Agadar bin le napak
Nek rêgay, qelaye tir
Pîşandat be şaye tir

***Pismam***



# Hawrêyetî

Dar gwêzêk û çemêk le seretay jiyaniyanewe hawrê bûn.

Hawînêk awî çemeke riwew kizî deroyîşit çemeke zor xembar bû ke lewaneye wşik bikat, le dilî xoyda witî:

"Xo eger wşik bikem em dar gwêzeş be cêm dêlê, dar gwêzeke hestî kird çend rojêke çemeke haje û kef çerandinî caranî nemawe boye lêy pirsî

– Hawrêkem bo weku caran dengit lêwe naye û goranî nalêyt?

– Hawrê, awim rûwe û kizî derwat detrsim wşik bikem eger wşik bikem toş renge be cêmbihêlî.


Dar gwêzeke be dilniyayyewe witî:

–Hawrê min û to aşnay yekîn min be towe cwanim, cêt nahêlim bişmirîn debê pêkewe bimrîn.

***Sîrwan Reşîd***



[redacted]



*Kawe*

